# Kuştina kurdan serbest e



Jina ducanî Remziye Bor li mala xwe ya Wanê ji aliyê polîsan ve hat qetilkirin û dozgerê tirk jî dixwaze polîsên kujer fihêl bike

**DOZGER BÛ ŞIRÎKÊ KUJERAN**

- Remziye Bor a 7 meh û nîvan ducanî bû li Wanê ji aliyê polîsan ve hat qetilkirin. Dozgerê tirk ê îdianameya bûyerê amade kir jî kujerên Bor fihêl dike.

**ÎDIANAMEYA SKANDAL**

- Dozger di îdianameyê de dibêje ku "ji ber sûcê endamtiya rêxistinê dê teqîbat neyê kirin" û bi vî awayî ser dosyayê dixwaze bigire...

→R3



**POLÎSAN CIWANÊ KURD ÎNFAZ KIR**

Li Seyrantepeya Amedê polîsan bi ser malekê de girt û ciwanek kuşt. Ciwanê ji aliyê polîsan ve hatiye kuştin Şeyhmuz Tayfun e û malbata wî li Îzmîrê ye...

→R3

**KURDISTAN VEGUHERANDIN ZINDANÊ**

## Deşt û çiya li kurdan hatine qedexekirin



- Walîtiya Êlihê gelek qadên bejahiyê yên bajar wek herêma ewlehiyê bi awayekî kêfî ji bo salekê li welatiyan qedexe kirin.
- Walîtiya Semsûrê herêmên Komir, Yazibaşi, Akçali, Çamyurdu, Oluklu û Koçaliyê ji bo 15 rojan wek "Herêma Ewlehiyê ya Taybet" îlan kirin.
- Li herêma Dêrsim û Botanê jî gelek herêm ji aliyê walîtiyan ve wek herêmên ewlehiyê hatine îlankirin û ji welatiyan re hatine qedexekirin...

R3

ROJEVA **Medya**

14 Çile Şemî 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 65

# Ciwanên Başûr çûn Qendîlê

**XELEKA LI DOR QENDÎLÊ**

Li gel şirîkatiya rayedarên PDK'ê yên bi hikumeta tirk re ku ji PKK û PYD'ê re dibêje 'terorîst' jî gelê Başûr li dor gerîla bûye xelek. Piştî Pêşmergeyên Dêrîn, bi sedan ciwanên başûrê welat jî berê xwe da Qendîlê.

**BERSIV DAN AKP Û PDK'Ê**

Meşa ciwanan a ber bi Qendîlê ve bû bersiva serdana serokwezîrê tirk Binalî Yildirim û şirîkatiya PDK'ê ya bêyom. Ciwanên ji Germiyan, Kerkûk, Silêmanî û Raperînê ji bo piştevaniyê bi gerîlayan re bikin, çûn Qendîlê... R-7



**Li dîasporayê meşên azadiyê**

- Bi pêşengiya KCD-E'yê li seranserê Ewropayê kurdistanî îro ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dadikevin qadan û dimeşin... RÛPEL - 7

**> Komelên Ciwan ji bo Ocalan dest bi kampanyayê dike...** →R7



## Her keyeyî rê qayûmêk!

- Qezaya Bismilî ya Amedî de muxtarê 3 taxan parekerdişanê xo yê medyaya komelkî ver wezîfe ra ameyî girewtiş û herinda nê muxtaran de azayê înan sey qayûm ame tayînkerdiş. Ame musayîş ke muxtarî fotografê Demîrtaşî û dayîkêk wezîfe ra ameyî girewtiş... RÛPEL - 11



## Ev guherîn ne bo demokrasiyê ye

- Hevberdevka HDK'ê Gulistan Koçyîgît hevdîtinên guherandina makeqanûnê yên li meclisa tirk didomin, nirxandin û got ku pêşnûmeya makeqanûnê ya nîqaşên wê tên kirin, tu tevkariya wê ji bo demokrasiyê tune ye. Koçyîgît da zanîn ku dê kurd û demokrat dengê na bi kar bînin... RÛPEL - 6




## Albuma Dîwana Dubeytî derket

- Hunermendên NÇM'a Stenbolê gelek beytên Baba Tahirê Hemedanî berhev kirin û di bin navê 'Dîwana Dubeytî' de albumeke nû amade kir. Album ji helbest, reqs û stranan pêk tê. Stranên di albumê de ji aliyê Zelal Gokçe, Nurcan Degîrmencî, Meral Tekçî û Serhat Kural ve tên gotin... RÛPEL - 9

## Li ber derê enstîtuyê nobeda zimanê kurdî

Li bakurê Kurdistanê têkoşîna ziman li gel gelek astengiyan jî heta roja îroyîn destkeftiyên xurt bi dest xistine. Yek ji van destkeftiyan jî Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ye ku bi salan e ji bo zimanê kurdî xebatên pir girîng pêk anîn lê bi KHK'a dawîn mohrek li deriyê wê jî xistin. Hevserokê enstîtuyê ji bo ziman li ber derî di nobedê de ye... R - 8



## PDK şerê AKP'ê fînanse dike

Serokê Lijneya Pîşesazî û Enerjiyê ya Meclisa Silêmaniyê Xalib Mihemed got ku PDK û AKP'ê lijneyeke aboriyê ava kiriye û diyar kir ku ev lijne şerê AKP'ê yê li dijî kurdên Bakur û Rojava fînanse dike û wiha got: "Ew top û balafirên ku Erdogan li Bakur û Rojava li dijî kurdan bi kar tîne, bi pereyên me hatine kirîn... RÛPEL - 7

Ahmet Atakan: **Tirkiye li Babê têk diçe** R5

Dê li dijî dagirkeriyê li ber xwe bidin... R5

R5 **HSD gundên dorpêçkirî rizgar dike**

www.arsivakurdi.org

## Li gorî şer xwe amade dikin

**JINÊN ROJAVA** yên ku pêşengiya xebatên avakirinê dikin, li nexweşxaneya leşkerî ya ku şervanên YPJ/YPG'ê tê de tên dermankirin jî erkên girîng girtine ser milên xwe. Hemşîreya bi navê Nûjîn Yûsif diyar kir ku ew ne tenê bi dermankirina şervanan re mijûl dibin, her wiha ew bi hêza manevî jî li nexweşên xwe dinêrin. Nûjîn Yusif da zanîn ku ew xwe li gorî şert û mercên şer amede dikin û wiha got: "Em jî li gorî atmosfera şer xwe amade dikin. Pir birîndar hene, tevî ku rewşa wan a birîndariyê giran e jî rewşa wan a moralê pir baş e. Lê dîsa jî, ji ber ku dema mirov nexweş e hinek bêhtir pêdivî bi moralê heye. Em jî alîkariya wan a moralê dikin." QAMIŞLO - ŞÛJIN



# Ji dîktatoriyê re na

**Jinên Enqereyê bertek nîşanî hevdîtinên destûra bingehîn dan û da zanîn ku bi pergala 'serokatiyê' jin bi tevahî tune tên hesibandin û tê xwestin pergaleke mêrserwer bê avakirin û dîktatoriya xwe bimeşînin**

Hevdîtinên guhertina Destûra Bingehîn didomin û jinan dengê xwe bilind kir û got ew 'ji rejîma yekkesî re dibêjin na.' Jinan wiha got: "Bi pergala serokatiyê re dê jin tune bên hesibandin. Biryar û raye di bin kontrola yek kesî de ye û ev jî li dijî azadî û demokrasiyê ye." Hevdîtinên heta niha ji aliyê meclisê ve hatine kirin ji aliyê AKP û MHP'ê ve hatin qebûlkirin.

Sekretera Jinan a Sendîkaya Kedkarên Buroyê (BES) Meryem Çag têkildarî mijarê axivî û diyar kir ku ew jin vê paketa Destûra Bingehîn qebûl nakin û wiha got: "Ev paket tê wateya dîlgirtina welat a ji aliyê kesekî ve. Di vê pêvajoyê de ku demokrasî lê tune ye, amadekirina vê paketê li dijî hiqûqê ye. Sedema komkujiyên jinan ew e ku jinan ji mêran re gotiye na. Yanî ji ber ku serî netewandiye. Ev pergala serokatiyê dê jinan bi tevahî tune bihesibîne."







Dayika Velî Saçilik ê ku di operasyona vegera jiyanê de milekî xwe winda kir û bi KHK'ê ji kar hat avêtin, Kezban Saçilikê jî da zanîn ku bêguman ew ji pergala serokatiyê re dibêjin na û wiha axivî: "Yek kes dê hemû darazê bigire destê xwe. Ev tê wateya têkçûna Tirkiyeyê. Ez li dijî vê pergalê me. OHAL'ê îlan dike û welat dibe gola xwînê." Welatiya bi navê Gîzem Erkan jî destnîşan kir ku desthilatdariya paşverû di demên dawîn de helwestên faşîzan ên zilm, zext û tecawizê zêde kirine û ev tişt anî ziman: "Bi fermanên KHK'ê re karker û kedkarên şoreşger bûn hedef. Hewl didin wisa dengê me qut bikin. Bi hevdîtinên li dijî hiqûqê li meclisê dîktatoriya faşîzan bi lez berdewam dike." *ENQERE - ŞÛJIN*

## Têkoşîna edaletê didome



Di 28'ê Kanûna 2011'an de balafirên TSK'ê li Roboskê komkujî pêk anî û di komkujiyê de 34 kes hatin qetilkirin û ji van yek jî Şivan Encû bû. Dayika Şivan Encû, Hediye Encû ev 5 sal e ji bo edaletê têkoşînê dimeşîne. Bîrdariya ku ji bo Roboskê ji aliyê Şaredariya Peyasê ve li Amedê hatibû çêkirin ji aliyê polîsên tirk ve hatibû hilweşandin.

Encû di 15 saliya xwe de tê zewicandin û 5 zarokên wê çêdibin. Hevjînê wê careke din dizewice. Encû rastî şîdet û heqaretan tê. Encû diyar kir ku hevjînê wê ew terk kiriye û li Rihayê bi cih bûye û zarokên wê jî ji wê vediqetin. Encû li gund tenê dimîne û wiha got: "Min tu carî hêviya xwe winda nekir. Ez carinan bi zarokên xwe re diaxivim." Tişta ku herî zêde Encû xemgîn kiriye ew e ku keça wê bi zorê bi mêrekî ku 30 salan jê mezintir re hatiye zewicandin. Encû destnîşan kir ku sê zarokên wê li cem bavê xwe li Rihayê dimînin û wiha axivî: "Ez bi piştgiriya zarokên xwe li ser pêyan bûm. Şivan debara me dikir. Gelek ji min hez dikir. Gelek ji jiyanê hez dikir. Çend bizinên me hebûn. Li wan mêze dikir. Şeva ku Şivan çû, got 'ez û hevalên xwe diçin sînor.' Min jê re got neçe. Lê Şivan çû û careke din nehat. Bedena wî ya parçebûyî hat. Bavê wî rojekê li me negeriya. Piştî Şivan bavê wî hewl da tazmînatê bigire. Lê min destûr neda."

Encû niha bi keça xwe û kurê xwe yê 15 salî Sînan re dimîne û diyar kir ku Sînan piştî birayê xwe dev ji dibistanê berdaye û Sînan dibêje ez naçim dibistana kesên ku birayê min qetil kirine û herî dawî wiha got: "Dewletê hem jiyana min û hem jî jiyana zarokên min têk bir. Ji ber kurdbûnê. Çi bikin bila bikin em dev ji kurdbûna xwe bernadin. Dê têkoşîn bidome." ŞIRNEX - ŞÛJIN

# Dê ji nû ve îtiraz bikin

Yek ji damezirînerên PKK'ê Sakîne Cansiz, nûnera KNK'ê ya Parîsê Fîdan Dogan û endama Tevgera Ciwanan Leyla Şaylemez di 9'ê Çileya 2013'an de li paytexta Fransa Parîsê hatibûn qetilkirin. Kujerê vê dozê yê girtî Omer Guney, di 17'ê kanûna 2016'an de bi gumanbarî miribû. Parêzerê malbatên her sê jinên şoreşger Antoine Comte ji malpera Orient XXI re axivî û got: "Mirina Omer Guney, ji bilî me bi kêrî her kesî tê."




Comte da zanîn ku mirina Omer Guney bi kêrî dewletên Tirkiye û Fransayê tê û wiha got: "Di nava dosyayê de gelek agahî û belge hene ku nîşan didin, Tirkiyeyê fermana komkujiyê daye. Ev mirov li ku dibin bila bibin, divê bersivê bidin edaleta Fransayê. Navê kesên tev li bûyerê bûne li ber destê me ne. Dozgeriya Fransayê bi rengekî vekirî, servîsên îstîxbarata tirk sûcdar kirin. Di mijara cînayetên siyasî de cara yekemîn dewlet wek berpirsyarê cînayetê hat nîşandan. Belê Omer Guney mir. Lê belê divê ev yek were fehmkirin. Di nava dosyayê de şirîkên vî sûcî û di asta siyasî de yên ferman dane, hene."

Parêzer Sylvie Boitel jî li ser kar û barên xwe yên ji niha de axivî û wiha got: "Em ê îtirazeke nû bikin ji bo lêpirsîn ji nû ve bê vekirin û dadgerekî nû yê lêpirsînê bê wezîfedarkirin. Ger dozger li ber rabe, ji bo dadgerekî lêpirsînê ji ber xwe ve bê diyarkirin, em ê bibin aliyê sivîl ê dozê. Ji bo ku em dosyayê di asta yên fermana cînayetê dane bidomînin, divê dadgerekî nû yê lêpirsînê bê wezîfedarkirin." *PARÎS - ANF*

## Li Girkê Legê kooperatîfên çandiniyê zêde dibin

Ji demên dêrîn heta roja îroyîn çandiniyê wek çandekê berdewam kiriye û bi xwe re civakbûn ava kiriye. Li bajarê Girkê Legê jî jin bi keda xwe aboriya komunal bi pêş dixin. Lijneya Aboriyê ya Kongra Star van projeyan ava dike. Lijneyê 600 kîsên tovên nîsk, genim û ceh li jinên kurd, ereb û seranserî bajarokên Girkê Legê, Rimêlan, Çilaxa û Til Koçer belav kirin. Dê li erdên gundên wek Melemerzê, Girasor, Tilkoçer û Mişêrfê jî bên çandin. Rêvebera Kongra Star a bajaroka Çilaxa Sûheyila Şemo têkildarî projeyên çandiniyê axivî û wiha got: "Em dixwazin careke din vê çandiniyê bi ruhê jinan zindî bikin. Yekemîn car jinan çandinî daye afirandin. Em jî wek jin îro hatine û bi destê xwe erdê xwe diçînin. Ev yek jî ji bo me wateyeke xwe ya cuda heye." Şemo destnîşan kir ku kurd û ereb bi hev re çandiniyê dikin. Rêveberiya Kongra Star a Girkê Legê Sebah Îsa jî bal kişand ser girîngiya aboriya jinan û wiha axivî: "Em zeviyan diçînin û hêza jinan a aborî ava dikin. Ji ber ku çandinî karekî pir pîroz e Divê hemû jin beşdarî kooperatîfê bibin û aboriyê pêk bîn in." GIRKÊ LEGÊ - ŞÛJIN



# Jinan banga parastina lezgîn kir

Zozanên Ayderê yên girêdayî Rîzeyê bi xwezaya xwe ya xweş tên zanîn. Tevî ku der barê wê de 5 biryarên parastinê hene jî lê avahiyên qaçax lê tên çêkirin. Dê di mehên biharê de TOKÎ lê avahiyan çêke û li ser vê yekê jinên parêzvanên mafê jiyanê ketin nav tevgerê. Silan Tena Ertaş diyar kir ku mirov ji ber xwezaya wê tên Behra Reş û ji ber vê divê TOKÎ avahiyan çêneke. Ertaş bal kişand ser dewlemendiya herêmê û wiha got: "Li şûna jiyana vir bê texrîbkirin divê bê parastin. Peywir dikeve ser milê kesên faliyetên turîzmê dimeşînin jî. Divê mafê jiyana wan ji dest neyê girtin." Ertaş anî ziman ku gelek kes ji vê karasetê ne agahdar in û got ku divê demildest parastina lezgîn pêk bê. Berdevka Meclisa Jinên Sosyalîst a Artvînê Nurcan Vayîç jî bertek nîşanî texrîbata xwezayê da û destnîşan kir ku xweza bi hevkariya sermaye û desthilatdariyê tê tunekirin û di vî alî de Ayder di hedefê de ye. RÎZE - ŞÛJIN



# Qetilkirina kurdan serbest e!

**Remziye Bor a 7 meh û nîvan ducanî bû û di serdagirtina malê de jiyana xwe ji dest da, di îdianameya ku hat amedekirin de dozger got: "Ji ber ku sûcê endamtiya rêxistinê ye dê şopandin neyê kirin"**

NÎMET OLMEZ - WAN / DÎHABER

Der barê Remziye Bor a 7 meh û nîvan ducanî, ya di 19'ê Nîsana 2016'an de li Taxa Hacibekir a Rêya Armûşê ya Wanê hatibû girtin û di encama gulebaranê de birîndar bûbû û piştî ku rakiribûn nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest dabû. Der barê hevjînê wê Îrfan Bor de jî ji aliyê Serdozgeriya Komarê ya Wanê ve îdianamea ku hat amdekirin, temam bû. Di îdianameya pêvekî ya ku der barê kuştina Bor a ducanî de hat amadekirin dozger got, "Ji ber sûcê endamtiya rêxistinê dê şopandin neyê kirin" û bi vî awayî rê li ber lêpirsîna ku dê ji bo peywirdarên cemaweriyê bihata meşandin, girt. Her wiha meqamê îdiayê der barê Îrfan Bor de yê li Girtîgeha Tîpa M a Wanê tê ragirtin jî bi îdiaya "Endamtiya rêxistinê" xwest doz bê vekirin.

Ji parêzerên malbatê Deniz Işik, destnîşan kir ku dozgerê ku lêpirsînê bi rê ve dibe li gorî kevneşopiya dewletê tev geriyaye, peywirdarên cemaweriyê parastiye û li gorî wê îdianame amade kiriye. Işik, bal kişand ser derhiqûqiya îdianameya hatiye amadekirin û destnîşan kir ku bêyî lêkolîneke krîmînal, dosya hatiye girtin.

Işik bi bîr xist ku Bor û malbata wê bi her awayî hatine mexdûrkirin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Em bangewaziyên ku me berê kiribûn, dubare dikin. Divê rastiya vê dosyeyê bê lêkolînkirin û sûcdar her kî be divê derkeve pêşberî edaletê. Heke dozger baş lêkolîn bikira, dê bûyer aşkera bibûya û dibe ku dosya ji bo yên cinayetên kiryar nediyar bibûya emsal. Lê hûn ji kîjan aliyê ve lê binêrin, Remziye Bor bi awayekî neheq hatiye kuştin, hevjînê wê bi awayekî derhiqûqî hatiye girtin û li holê pitikeke bêxwedî hatiye hiştin. Divê ev derhiqûqî demildest ji holê bê rakirin û demildest sûcdar bên darizandin."



# PKK'ê êzidî ji nû ve zindî kirin

Di ser fermana Şengalê re du sal derbas bûn. Şopên wê hê nû ne. Gelek ciwanên êzidî yên ji komkujiyê rizgar bûn tev li nava refên PKK'ê bûn. Yek ji wan jî Sorgul Botan e. Botan wiha behsa wan rojan dike: "Li ser bûyerên bi serê me de hatine çi qasî were nivîsandin, dê ew qasî jî neyê jibîrkirin. Wê rojê ber destê sibehê bû. Çeteyan dor li gundê me girtibûn. Dayika min li cem min nebû. Çûbû cihekî din. Min xwest biçim cem wê, lê DAIŞ gelekî nêz bûbû. Jinbiraya min bi destê min girt û xwest ez bibezim. Heta çiyayê Şengalê em reviyan. Em ketin hundirê şikeftekê. Çend rojan em li wir man."

Botan anî ziman ku wan di rê de gerilayan dîtine û wiha bi lêv kir: "Min berê nizanîbû ew kî ne. Lê ev ji bo me ne girîng bû. Ji bo me rizgar bikin hatibûn. Dema min ew dît, ji kêfa min nezanî ez ê çibikim. Em çûn Serdeşt. Gerîlayan xwarin û av ji me re anîn. Gelekî me bi me re biliyan. Ji xwe piştre korîdor hat vekirin. Bi hezaran Şengalî ji wê korîdorê derbasî cihê ewle kirin. Yên mayî jî li çiyayê Şengalê man. Piştî wextekê hêza xweparastinê ya gelê Şengalê hat avakirin. Ciwan, extiyar jin ên Şengalê ji bo parastina Şengalê ketin nava liv û tevgerê. Ev hebû bi saya PKK'ê bûn. Eger PKK nebûya Şengal nedima."

**HÊZA XWE FERQ KIR**

Botan da zanîn ku piştî ew tev li PKK'ê bûye ketiye ferqa hêza xwe û ev tişt got: "Ez niha pê bawer im ku tevahiya gelê Şengalê bi vî rengî ye. Artêşeke me ava bû. Êdî Şengal xwe bi xwe, xwe diparêze. Ev hemû bi saya PKK'ê û Rêber Apo bû. PKK'ê Şengal, êzidîtî ji nû ve zindî kir." *BEHDÎNAN - ANF*



# Ji îstîsmarkar re 25 sal ceza hat xwestin

Malbata Xelîl a ji ber şerê li Sûriyeyê ji neçarî welatê xwe terk kir û hat li navçeya Erdemlî ya Mêrsînê bi cih bûn, di 19'ê tebaxa 2016'an de zaroka wan a 12 salî L. H. rastî îstismara zayendî ya xwediyê mala wan Alî K. (50) hatibû. Di çarçoveya lêpirsîna hat despêkirin de, der barê îstîsmarkar Ali K. de ji aliyê Dozgera Komarê ya Mêrsînê Kadriye Yaniktepe ve îdianame hat amadekirin û îdianame ji aliyê 2'yemîn Dadgeha Cezayê Giran a Mêrsînê ve hat qebûlkirin.

Di îdianameyê de der barê Ali K. ê girtî de, bi tewanbariya "Îstîsmara zayendî ya zarokan" û "Binpêkirina huriyeta kesan" ji 10 salan heta 25 salan cezayê girtîgehê hat xwestin. Dê yekemîn rûniştina dozê di 17'ê Çileyê de bê dîtin. *MÊRSÎN - DÎHABER*




## Walî 15 rojan qedexe îlan kir

Walîtiya Semsûrê li herêmên Komir, Yazibaşi, Akçali, Çamyurdu, Oluklu û Koçali yên dikevin sînorê Fermandariya Cendirmeyan ji bo 15 rojan wek "Herêma Ewlehiyê ya Taybet" îlan kir. Walîtiye di daxuyaniya nivîskî de anî ziman ku herêmên navborî di navbera 12'ê û 26'ê çileya 2017'an de heta 15 rojan wek "Herêma Ewlehiyê ya Taybet" hatiye îlankirin. **SEMSÛR**



## Ji ber xemsariyê astengdar bû

Demhat Toga yê 2 salî di qedexeya 14'ê kanûna 2015'an de ya li navçeya Cizîra Şirnexê hate îlankirin de birîndar bûbû. Piştî ku qedexe li navçeyê hat îlankirin dayika 5 zarokan Yeter Toga û zarokên xwe ji taxa Cûdî ne derketin û li ber xwe da. Mala Toga ji aliyê tangên ku li taxa Cûdî hatin bicihkirin ve hat topbarankirin û agir bi mala Toga ket. Piştî agir bi malê ket Toga zarokên xwe yên mezin ji malê derxistin. Demhatê biçûk di dergûşê de ma û dest û rûyê wî şewitîn. Demhat ku birîndar bû, ji ber xemsariya doktoran nehat dermankirin û dê heya dawiya emrê xwe astengdar be. **ŞIRNEX**



## THY'ê gef li karkeran xwarin

Rêveberiya Rêyên Hewayî yên Tirk (THY), ji Sendîkaya Hava-Îşê xwest ku karker ji bo sala 2017'an zemê nexwazin. Rêveberiya THY'ê diyar kir ku an dê karkeran derxin an jî dê heqê karkeran di 2017'an de zêde nekin. Sendîkaya Hava-Îş'ê têkildarî mijarê daxuyaniyeke nivîskî da û diyar kir ku THY armanc dike ku karkeran ji kar derxe. Sendikayê da zanîn ku karker bi zemê tên tehdîtkirin û dixwaze îsal doza zemê û heqê xwe li wan nekin. **STENBOL**




## Li Girtîgeha Elezîzê îşkence

Girtiyê siyasî yê bi navê Ercan Bînay ji Girtîgeha Tîpa T a Elezîzê name nivîsand û anî ziman ku tevî 19 kesan ji Girtîgeha Amasyayê sirgûnî Elezîzê hatine kirin. Bînay anî ziman ku zext li girtiyên hatine sirgûnkirin hatiye kirin ku bi rengekî tazî li ser lêgerînê bikin û wiha got: "Li koguşan jî di bin navê sermijartinê de her sibeh û êvarê şîdeta fîzîkî li me tê kirin. Rêveberiya girtîgehê, mafê hevdîtina vekirî ya girtiyan kiriye 2 mehan carekê. Mafê axaftina bi rêya telefonê jî kiriye pazdeh rojan carekê." **ELEZÎZ**



## Nasnameya kesê ku polîsan kuşt, diyar bû

Li Semta Seyrantepe ya Yenîşehira Amedê polîsan bi ser navnîşanekê de girt û kesek kuşt. Derket holê ku kesê ji aliyê polîsan ve hate kuştin ê bi navê Şehmuz Tayfun e. Walîtiyê têkildarî mijarê daxuyanî da û anî ziman ku di malê de pevçûn derketiye û di pevçûnê de hatiye kuştin. Hat zanîn ku malbata Tayfun li Îzmîrê dijî û bav û dayika wî sala par di lêpirsînekê de hatine binçavkirin û girtin. Hat zanîn ku cenazeyê Tayfun ji bo otopsiyê birine Saziya Tipa Edlî ya Nexweşxaneya Lêkolînê ya Gazî Yaşargilê. *AMED - DÎHABER*

## Dest danîn ser alîkariya ji bo zarokan

Li bajaroka Dêrgulê ya Şirnexê leşkerên Qereqola Îkîzceyê duh danê sibê dest danî ser qamyoneke alîkariyê ya ji bo gelê Şirnexê ku ji Amedê hatiye. Li ser destdanîna leşkeran welatiyê bi navê Nayîf Uysal bertek nîşan da. Leşkeran welatî binçav kirin. Alîkariya ku ji bo gelê Şirnexê hatibû ji cil û bergên zivistanê û xwarina zarokan pêk dihat. Hate zanîn ku leşkeran alîkarî desteser kiriye û biriye Qereqola Îkîzceyê. *ŞIRNEX - DÎHABER*

## Bazara li ber sir û seqema dijwar

Wan û navçeyên wê ku demekê navenda bazara ajalan bûn, piştî ku nêçîr hate qedexekirin, xwedîkirin zêde bû, bi operasyonên leşkerî yê domdar û şertên Rewşa Awarte, ew rewşa xwe ya berê ji dest daye. Kesên ku sewalan difiroşin, havînê bi qedexeyên "Herêmên Ewlehiyê yên Taybet" û zivistanî jî bi sermayeke tûj re hev rû dibin. Xwediyên heywanan ku li gel rêyên girtî jî sewalên xwe ji bo firotinê digihînin bazara ajalan, di serê sibehê de, li ber sermaya tûj, dikevin bazara kirîn û firotina ajalan. *WAN - ANF*

www.arsivakurdi.org

## Bahozê Fransa felc kir



**BARÎNA BERFÊ** û bahoza dijwar a li Fransayê çûn û hatina gelek herêman asê kir. Ji ber barîna berfa zêde û bahoza dijwar li bakurê Fransayê ceyrana 200 hezar avahiyan hat birîn û gelek avahiyan jî xesar dît. Li bakurê rojavayê Fransayê jî ji ber bahozê gelek dar ji kok ve rabûn û seferên trênan hatin betalkirin. Ji ber şikestina daran li gelek herêman jî rê hatin girtin û trafîk hat asta sekinînê. Ji ber bahoza zêde li gelek balafirgehan rêwî asê man. Hat ragihandin ku bahoza dijwar berê xwe daye aliyê rojhilatê Fransayê. Ji ber vê yekê hişyarî ji bo gelê rojhilatê Fransayê hat dayîn û hate gotin ku xisara ji ber bahozê dibe ku zêde bibe. **PARÎS**



# AKP demokrasiyê têk dibe

**Rêxistina Çavdêriyê ya Mafên Mirovan rapora xwe ya mafên mirovan weşand. Di raporê de hatiye destnîşankirin ku AKP li şûna xurtkirinê demokrasî têk biriye û bi hezaran muxalîf girtine û ew ji karên xwe dûr xistine**

Rêxistina Çavdêriyê ya Mafên Mirovan (Human Rights Watch) ku têkîldarî mafên mirovan li seranseriya cîhanê lêkolînan dike û raporan diweşîne, rapora mafên mirovan a cîhanê ya 2017'an aşkera kir. Di raporê de beşeke fireh ji bo Tirkiyeyê hatiye veqetandin û hatiye destnîşankirin ku desthilatdariya AKP'ê hewldana darbeyê ya 15'ê tîrmeha 2016'an ji bo berjewendiyên xwe veguherandiye firsendê.


Di raporê de tê diyarkirin ku desthilatdariya AKP'ê bi armanca zextê li mafên mirovan bike û mafên bingehîn ên demokratîk ji holê rake hewldana darbeyê wek amûrekî bi kar tîne. Di raporê de operasyonên li dijî sazî û dezgehên çapemeniyê û siyaseta kurd hatine bibîrxistin û hatiye gotin ku desthilatdariya AKP'ê di 6 mehên dawîn ên 2016'an de gelek sazî û dezgehên çapmeniyê girtine û rojnameger û siyasetmedarên kurd xistine zîndanan.

Di raporê de ji kar dûrxistina kedkarên cemewariyê û girtina saziyên sivîl ên civakî jî hatine bibîrxistin û hatiye destnîşankirin ku desthilatdariya AKP'ê bêyî ku prosedurên hiquqî û darazî bixe meriyetê bi hezaran kedkar ji kar dûr xistine, binçav kirine û bi sedan saziyên civakî yên sîvil girtine.

**PENABERAN DIKUJE**

Mijareke din a xwe di raporê de dide der jî hevpeymana penaberan a di navbera Yekitiya Ewropayê (YE) û Tirkiyeyê de hatiye mohrkirin e. Di raporê de hatiye destnîşankirin li gel ku bi Tirkiyeyê re peyman hatiye mohrkirin jî, Tirkiye gelek penaber ji sînorê Sûriyeyê vedigerîne û yên ku bixwazên derbas bibin jî, li ser sînorê Tirkiye û Sûriyeyê ji aliyê leşkerên tirk ve hatine kuştin û birîndarkirin.

Dîrektorê Ewropa û Asyaya Navîn ê Rêxistina Çavdêriyê ya Mafên Mirovan Hugh Williamson der barê raporê de axivî û got ku Tirkiyeyê li şûna xurtkirina demokrasiyê bi awayekî tund bi ser muxalîfan de çû û wekîlên kurd girtin. ***AMED***



## Hovîtiya li Kurdistanê

**Di raporê beşa herî balkêş jî hovîtiya dewleta tirk a li hemberî bajarên Kurdistanê ye. Rapor balê dikişîne ser hovîtiya dewleta tirk a li dijî bajarên Kurdistanê û hatiye diyarkirin ku di 2016'an de gelek bajarên Kurdistanê bi awayekî hovane hatine hilweşandin û mafên bingehîn ên bi hezaran kesî hatine binpêkirin.**

## Amerîka li xwe mikur hat

Artêşa Amerîkayê bi awayekî fermî kuştina 33 sivîlên li Kûndûzê qebûl kir. Di 3'ê mijdara 2016'an de artêşa Amerîkayê bi hinceta ku êrîşî çeteyên Talîbanê bike, gundekî bajarê Kûndûzê yê Afganistanê bombebaran kir û 33 kesên sivîl qetil kirin.

Fermandariya Artêşa Amerîkayê ya Afganistanê der barê bomberanê de daxuyaniyek da û diyar kir ku bi armanca alîkariyê bidin hêzên amerîkî û afgan ên bûne hedefa çeteyên Talîbanê, balafirên şer ên Amerikayê ketine dewrê û gund bomberan kiriye. Fermandariyê di daxuyaniya xwe de qebûl kir ku 33 sivîlan di encama vê bomberanê de jiyana xwe ji dest daye û 27 sivîl jî birîndar bûne.

Fermandariyê li gel vê mukirhatina xwe jî wekî ku kuştina kesên sivîl biparêze, destnîşan kir ku bomberan di çarçoveya parastina rewa de pêk hatiye. Li aliyê din Fermandarê Yekîneyên Amerîkayê yên li Afganistanê general John Nicholson jî got ku ew ji ber mirina mirovên sivîl ên bêguneh gelekî xemgîn e. ***KABÎL***



## Avahiya Walîtiya Mûsilê hat rizgarkirin



Operasyona rizgarkirina Mûsilê di qonaxa duyemîn de bi pêşveçûna artêşa Iraqê berdewam dike. Fermandarê operasyona rizgarkirina Mûsilê Abdulemîr Yarûllah der barê pêşveçûnên artêşa Iraqê de axivî û diyar kir ku avahiya walîtiyê, avahiya Civata Walîtiyê û Komalgeha Fermanberên Hikmî ji aliyê hêzên dijterorê û artêşa Iraqê ve hatine rizgarkirin.

Yarûllah di berdewama daxuyaniya xwe de destnîşan kir ku hêzên dijterorê û artêşa Iraqê taxa Sedîriyê û pira duyemîn a bajar jî ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kirine û xistine bin kontrola xwe. Bi vê yekê re her sê pirên sereke yên bajar ji çeteyan hatin rizgarkirin û ketin bin kontrola artêşa Iraqê. ***MÛSIL***

## 'Kurd mutefîkên herî baş in'

Namzetê Wezîrê Karên Derve yê serokê ayende yê Amerîkayê Donald Trump, Rex Tillerson der barê polîtîkayên Amerîkayê yên rêveberiya nû de axivî û diyar kir ku ew ê dostaniya xwe bi kurdan re berdewam bikin û li Sûriyeyê li dijî DAIŞ'ê alikariya kurdan bikin.

Tillerson der barê Rojava de nêrînên xwe wiha anîn ziman: "Li dijî DAIŞ'ê mutefîkên me yên herî baş kurd in." Tillerson bi lêv kir ku ew ê ji bo çêkirina navbera Tirkiye û kurdan jî bikevin nav hewldanan.

Tillerson der barê hewldanên Rûsya, Îran û Tirkiyeyê yên li hemberî Sûriyeyê de jî nêrînên xwe anîn ziman û da zanîn ku Rûsya, Îran û Tirkiye bêyî beşdarbûna me dîkteya şertan dikin û ev tişt anî ziman: "Divê em dîsa bi serokomarê Tirkiyeyê Erdogan re hevdîtinan pêk bînin û berê wî ji Rûsyayê vegerînin û bidin Amerîkayê. Rûsya ne mutefîkekî wisa ye ku mirov pê re kar bike, divê ew bi Amerîkayê re bibin mutefîk." ***WASHINGTON***



## Serveta artêşa Sûriyeyê cemidandin

Amerîkayê bi hinceta ku çekên kîmyewî bi kar anîne der barê rayedarên leşkerî yên artêşa Sûriyeyê de biryara sepandina danekirinê da.

Der barê mijarê de Wezareta Xezîneyê ya Amerîkayê daxuyaniyek da û ragihand ku di nav de general, mîralay, serpêl û şef jî heyî, bi giştî der barê 18 rayadarên leşkerî yên artêşa Sûriyeyê de biryara sepandina danekirinê hatiye dayîn. Di daxuyaniyê de hat destnîşankirin ku rayedarên leşkerî yên ku der barê wan de biryara sepandina danekirinê hatiye dayîn, serveta wan a Amerîkayê hatiye cemidandin. ***WASHINGTON***



## Çeteyan li dijî hev şer îlan kir

**Rêxistinên terorîst Talîban û DAIŞ ên ku ola îslamê terorîze dikin, li dijî hev şer îlan kir. Li gorî agahiyên ku ji çapemeniya Afganistanê hatin bidestxistin rêxistinên terorîst Talîban û DAIŞ ên ku beriya niha di navbera hev de agirbest îlan kiribû, li dijî hev cîhad îlan kiriye û dest bi şer kiriye. Hat ragihandin ku her du rêxistinên terorîst li dijî hev êrîşên dijwar pêk tînin û gelek çeteyan ji hev dikujin. AMED**

## Li paytexta Sûriyeyê teqîn

**Li Balafirgeha Leşkerî ya Mazzehê ya herêma Kefersora Şamê teqînek pêk hat. Rayedarekî leşkerî piştî teqînê ji televîzyona fermî ya Sûriyeyê re axivî û diyar kir ku teqîn bi hevkariya muxalîfan û Îsraîlê pêk hatiye. Rayedar di berdewamê de got ku beriya teqînê muxalîfan roket avêtine balafirgehê û piştre jî jetên Îsraîlê bombe li balafirgehê barandine. Hat ragihandin ku di encama têqînê de gelek kes mirine. ŞAM**

# Êdî têkçûna xwe venaşêrin

**Dewleta tirk a ku dixwaze Babê dagir bike her ku diçe bêhtir dixitime. Nivîskar Ahmet Takan vê têkçûnê wiha tîne ziman: "50 leşkeran daxwaznameyên îstîfayê dan. Li Babê îxanet li me tê kirin û wisa xuya ye ku em ê hîn bêhtir bedelê bidin."**

NAVENDA NÛÇEYAN



Nivîskarê rojnameya Yenîçagê Ahmet Takan anî ziman ku 50 leşkerên artêşa tirk ên ku tev li operasyona dagirkirina Babê bûn, daxwaznameyên xwe yên îstîfayê dane. Takan diyar kir ku hin hêzên di nava OSO'yê de jî çekan didin DAIŞ'ê. Di nivîsê de têkçûna Tirkiyeyê ya li Babê aşkera dibe.

Di gotara xwe ya dawîn de Takan destnîşan kir ku wan îxaneta gelek hêzên di nava operasyona Mertalê Firatê de, belge kirine û wiha domand: "Me li axa Sûriyeyê gelek şehîd dan. Operasyon didomin lê îxanet jî gelek in. Ger wiha bidome dê bedelên me girantir jî bibin. Di 8'ê çileyê de li bajaroka Extarînê dema ku hin hêzên xayîn ên di nava OSO'yê de ji çeteyên DAIŞ'ê re madeyên teqemenî û çekan dibirin, hatin girtin."

**PIR LEŞKER DIMIRIN**

Di berdewamê de Takan dibêje ku ev bûyer tenê parçeyek ji bûyerên heyî ye û wiha pê de çû: "Ev gotinên me hinek derdoran diêşînin lê divê em bibêjin. Niha nexweşxaneyên Kîlîs û Hatayê bi leşkerên birîndar tijî bûne. Dawiya van bedelan jî nayê. Jixwe demek berê jî me bêmoraliya leşkerên me yên di operasyona Mertalê Firatê de parve kiribû."

**MIJARA CENAZEYAN**

Di dawiyê de jî Takan vê îtîrafê dike: "Li gorî agahiyên ku min ji çavkaniyên TSK'ê wergirtine, di nav de serbaz û berbaz jî gelek çawişên pispor ên li Babê, daxwaznameyên îstîfayê dane. Kes napirse gelo cenazeyên 2 leşkerên me yên di destê DAIŞ'ê de çawa anîn. Lê min pirsî û hîn bûm ku li hemberî 6 cenazeyên DAIŞ'iyan her du cenazeyên me jî dane."



## Artêşa tirk li pey provokasyonan e

Êrîşên artêşa tirk a dagirker ên li dijî rojavayê Kurdistanê berdewam in. Navenda Ragihandina YPG'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku hêzên artêşa tirk a dagirker di 12'ê çileyê de bi çekên giran û topên hewanê êrîşî çeperên hêzên wan ên li gundê Eyn Deqnê yê Efrînê kiriye. YPG'ê da zanîn ku balafirên bêmirov ên artêşa tirk jî di heman rojê de saet di 21.30'an de li ser gundên Ziyaret û Çarixlî yên Kobanê firiyane û çeperên hêzên wan keşf kirine. EFRÎN



## Tirkiye li Babê malên kurdan talan dike

Li gorî agahiyan ji Babê, hêzên artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê malên kurdan ên li gundê Şedod ê Babê, talan kirin. Hat zanîn ku heta niha herî kêm 30 malên kurdan hatine talankirin. Artêşa tirk bi dagirkirina bakurê Sûriyeyê ji bo guhertina demografyaya herêmê polîtîkayên koçberkirin û rûxandina malên pêkhateyên herêmê dimeşîne. Di vê çarçoveyê de heta niha bi dehan gund hatine rûxandin û bi deh hezaran welatî koçber kirin. MINBIC



## PJAK'ê bersiva Yildirim da

Hevserokê PJAK'ê Siyamend Moînî û gelek endamên din ên PJAK'ê serdana Nûnertiya PYD'ê ya li Silêmaniyê kir. Şande ji hêla Nûnerê PYD'ê yê Başûrê Kurdistanê Xerîb Hiso û endamên din ve hat pêşwazîkirin. Di serdanê de endamên PJAK'ê bertek nîşanî daxuyaniyên Serokwezîrê Tirk Bînalî Yildirim ên der barê Rojava, PYD û PKK'ê de dan û piştgiriya xwe ya bi Rojava re ragihand. Her wiha daxwaza semînerekê jî ji endamên PYD'ê hat kirin. SILÊMANÎ



## Şêniyên El Cerniye xwe bi rêxistin dikin

Bi armanca birêxistinkirina gundewarên rojavayê Reqqayê, TEV-DEM kete nava liv û tevgerê û dest bi rêzecivînan kir. Bi tevlîbûna TEV-DEM, rêveberiya xweser û şervanên YPG/YPJ'ê bi welatiyên El Cerniyê re civînek hat lidarxistin. Di civînê de geşedanên dawîn hatin nirxandin û girîngiya birêxistinkirina civakê hate vegotin. Piştî nîqaş û nirxandinan biryara vekirina meclisa bajarokê El Cerniye hat dayîn. KOBANÊ

## Çeteyan zarokatiya wan jê dizî

Zarokên gundewarên Reqqayê ji dibistanê mehrûm bûn û sêwî man, dema ku mirovekî çekdar bibînin ditirsin, direvin û xwe vedişêrin, ev jî rewşa zarokên li gundên Reqqayê ye.

Ji hovîtiya çeteyan û şerê li herêmê herî zêde zarok pê bandor dibin. Zarokên bi navên Hela Abdullah û Remedan Îsa ji gundê Şeyîmî yê Reqqayê ne. Tevî hemû kêfxweşiya şêniyên gund a bi rizgarkirinê re jî, hovîtî, zilm û işkenceya ku ji çeteyan kişandî zû bi zû ji bîr nabe.

Remendan Îsa (10) par dema ku li gel bavê xwe ji Girê Spî vedigeriya mal di teqîna mayînekê de bavê xwe winda dike û lingê wî jî qut dibe. Jiyana Remedanê ku zarokatiya xwe bi nexweşiyan derbaskirî niha jî êdî bi gopalekî re dijî.

Zaroka bi navê Hela Abdullah (11) jî bi dagirkirina gundê wan dest ji dibistanê berdide û wiha dibêje: "Ez pir ji dibistanê hez dikim. Lê min tenê pola yekê xwend û çeteyan destûr neda. Em ji mafê xwe yê dibistanê mehrûm man. Ji vê girîngtir ez ji zarokatiya xwe mehrûm bûm. Em derdiketin derve û her tim bi xemgînî vedigeriyan malê." *REQQA - ANHA*





## Di bombebaranê de 5 çete hatin kuştin

Şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê bi rizgarkirina gundê Kurmanco bi dehan gundên di bin dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê de ne xistin dorpêçê. Hat zanîn ku şervanên Xezeba Firatê û hêzên koalîsyona navneteweyî li dijî çeteyên li vê herêmê dest bi operasyonê kirin. Hat zanîn ku di bombebarankirina gundên li vê herêmê de 5 çete hatin kuştin û cenazeyên wan ketin destê şervanan. Operasyona şervanan a li herêmê didome. REQQA - ANHA



## El Cerniye bi azadiyê ronî bû

Çeteyên DAIŞ'ê li gund û bajarên girêdayî Reqqayê hemû şêwazên zordarî, kuştin, jêkirina dest û seriyan, lêdan, şewitandin, girtin û işkenceya fîzîkî û derûnî li dijî welatiyên sivîl pêk dianîn. Di hemleya rizgarkirina Reqqayê de bi sedan gund ji çeteyan hatin rizgarkirin. Yek ji van herêman jî bajaroka El Cerniye ku mezintirîn bajarokên gundewarên bakurê rojavayê Reqqayê ye. Şêniyên gund piştî rizgarkirinê vegeriyan warên xwe, bi gerandina govendan û tilîliyan şadiya azadiyê nîşan da. REQQA - ANHA

## Dê vîna gelan dawî li dagirkeriyê bîne

Hevseroka Meclisa Sivîl a Minbicê Sozdar Xalid da zanîn ku ew dê gelê herêmê li dijî hemû dagirkeran li ber xwe bide.

Sozdar Xalid anî ziman ku herî zêde dewleta tirk destwerdana Sûriyeyê dike û wiha domand: "Tirkiyeya dagirker bi vê yekê dixwaze pirsgirêkên xwe yên hundirîn derbasî Sûriyeyê bike û pêşiya fikra neteweya demokratîk bigire. Ji bo vê yekê jî axa Sûriyeyê dagir kir."

Di dawiyê de jî Sozdar Xalid ev tişt anî ziman: "Armanca Tirkiyeyê astengkirina projeya federaliya demokratîk e. Ditirse ku ev proje derbasî Tirkiyeyê jî bibe û dawiyê li AKP'ê bîne. Em bêdengiya qada navneteweyî ya li dijî êrîşên Tirkiyeyê jî şermezar dikin. Dê gelê me bi berxwedan û vîna xwe dawiyê li dagirkeriya Tirkiyeyê bîne." MINBIC - ANHA

## Hovîtiya li ser sînor a leşkerên tirk a 5 mehan

Artêşa tirk a dagirker di nava 5 mehên dawîn de li ser sînorê Rojava 7 welatî qetil kirin û işkence li gelek welatiyan kir.

Di 5 mehên dawîn de artêşa tirk li ser sînorê Rojava di nav de jin û zarok jî bi dehan sivîl qetil kirin. Di vê çarçoveyê de artêşa tirk ciwanê bi navê Hemze Ebdilrehman di 5'ê îlona 2016'an de li ser rêya Amûdê, ciwanên bi navên Yehya Feysel, Xalid Ceger û Mihemed Elî Neme jî di 5'ê kanûnê de li nêzî gundê Ebû Cerade yê Dirbêsiyê qetil kirin. Li gel ciwanan 14 kes jî işkence kirin.

Artêşa tirk birayên bi navên Rafet Osman (18), Fîras Osman (27) û Mezher Osman (25) ên ku dixwestin derbasî Bakur bibin li ser sînorê Amûdê qetil kirin. Birayên bi navên Yûsif Ebdilhemîd (16) û Ebdilhemîd Yûsif (19) ên ji erebên Zirganê piştî işkenceyeke giran avêtin ser sînor. Herî dawî jî ciwanên ji Dêra Zorê Zahir Xelab (26), Yasîn Mumtaz Elûş û Mihemed Şêxanî (32) li ser sînor rastî işkenceyeke giran hatin. DIRBÊSIYÊ - ANHA

## Hol bi tevahî bi rêxistin kirin

Bi armanca avakirina komuna taxa El Weset El Xerbî, TEV-DEM'ê bi şêniyên taxê re civînek li dar xist. Di civînê de nûnerên TEV-DEM, Kongreya Star û bi dehan şêniyên taxê amade bûn. Di civînê de Endamê Buroya Têkiliyên Giştî ya TEV-DEM'ê Yûsif Şêxo diyar kir ku komun di her alî de yekitiya civakê ava dikin. Di dawiya civînê de hevserokên komunê hatin hilbijartin û komîteyên wê ava kirin. Bi vê yekê komunên hemû taxên Holê hatin avakirin. HESEKÊ



## 188 malbat li kampa Holê bi cih bûn

Ji ber şer û pevçûnên li herêmê koçberiya ber bi Rojava ve didome. Hat zanîn ku di 12'ê çileyê de jî 131 malbatên ji Mûsilê hatin Hesekê. Malbatên ku derbasî Hesekê bûn li Kampa Holê hatin bicihkirin. Her wiha 57 malbatên ji herêmên cuda yên Sûriyeyê jî li kampê hatin bicihkirin. Endamên Rêveberiya Kampê diyar kir ku hejmara penaberên Iraqê her ku diçe zêdetir dibe. Endamên kampê banga alîkariyê li rêxistinên navneteweyî kir. HESEKÊ



www.arsivakurdi.org

ROJEVA Medya
14 Çile 2017 Şemî

# Meclis xwe betal dike

**Xala 7'emîn a guherandina Qanûna Bingehîn ku der barê "serokomariya partiyî" de ye bi 340 dengan hat qebûlkirin. Meclis xwe betal dike, dîktatorî qanûnî dibe û krîza aborî ji niha ve gel perîşan kir**

Li meclisa tirk, hevdîtinên guherandina Qanûna Bingehîn didomin. Di hevdîtinan de her ku diçe tansiyon zêde dibe û ji ber şerê li meclisê kursiya ku axaftin lê tê kirin texrîb bûbû û kursî bi temamî hat guherandin.

Di meclisê de xalên herî krîtîk ku pêşî li pergala serokdewletiyê vedikin, xalên 6, 7 û 8 di meclisa Tirkiyeyê de hatin erêkirin. Piştî hevdîtinên der barê xala 7'emîn a guherandina Qanûna Bingehîn ku xala herî krîtîk e dengdayîn pêk hat û bi 340 dengan hat qebûlkirin. Ji bo xala 7'emîn 136 dengên na hatin dayîn. Madeya 7'emîn, dê sererastkirina têkildarî serokomartiya partiyî bi xwe re bîne.

Di encama dengdayîna xala 6'emîn e guherandina Qanûna Bingehîn de, bi 343 dengên erê hat qebûlkirin. Di meclisa Tirkiyeyê de bi tevlîbûna 418 parlamenteran dengdana li ser 8'emîn a Destûra Bingehîn pêk hat. Di encama 340 dengên erê de sîstema serokatiyê ya li Tirkiyeyê hat qebûlkirin.

**HDK DIBÊJE 'NA'**

Hevberdevka HDK'ê Gulistan Koçyigit hevdîtinên guherandina Qanûna Bingehîn ên li meclisê didomin, nirxandin û diyar kir ku pêşnûme li dijî demokrasiyê ye, biçin referandûmê dê ji pergala serokdewletiyê re bibêjin na.

Koçyigit girtina hevserok û parlementerên HDP'ê bi bîr xist û wiha got: "Bi rakirina destnedayînê parlamenterên HDP'ê li girtîgehan rehîn tên girtin." Koçyigit diyar kir ku heke pêşnûmaya Qanûna Bingehîn berpêşî gel bê kirin ew ê bibêjin 'na' û axaftina xwe wiha domand: "Me tevî hemû hevgirên xwe ev nîqaş kirin û çi pergala serokatiyê be, çi serokomariya partiyî me, em ê li dijî van rejîmên yekzilamî bibêjin 'na'."

Koçyigit destnîşan kir ku ew ê xwe bigihînin hemû derdorên civakê û sedemên 'na'yê ji wan re vebêjin. *ENQERE*



## 'Sedema krîzê rîska polîtîk e'

Bi rageşî û niqaşên li meclisê re dolar û euro li hemberî TL roj bi roj zêde dibe. Têkildarî rewşa krîza aborî û siyasî Doç. Dr. Ozgur Muftuoglu, Aborînas Mustafa Sonmez û Aborînas Prof. Dr. Hayri Kozanoglu nirxandin kirin.

Doç. Dr. Ozgur Muftuoglu, anî ziman ku gelek sedenêm ku bandorê li zêdebûna dolar û euro dikin hene û wiha got: "Xizanî zêde bûye, bêbawerî zêde bûye. Rageşiya li Tirkiyeyê û şerê li Sûriyeyê, bandoreke neyînî li ser aboriyê dike. Piraniya aboriya Tirkiyeyê ji bo ewlehiyê tê xerçkirin. Sedemeke din jî pirsgirêka global e." Muftuoglu, destnîşan kir ku heta demokrasî xurt nebe û mirov nekarin pêşeroja xwe diyar bikin, pirsgirêk çareser nabe.

Aborînas Mustafa Sonmez jî destnîşan kir ku bandora hundir û derve li ser zêdebûna dolar û euro heye û wiha got: "Li nava Tirkiyeyê rîskên polîtîk, aborî û jeopolîtîk pir zêde bûyne. Ev rîsk kesên biyanî pir eleqedar dike. Ji ber ku biyanî li vir dikevin nava tevgerê dolar zêde dibe. Sedemeke din rageşiya li meclîsê ye. Li meclîsê sanaryoya yekmirovî heye. Ev rageşiya rejîma yekmirovî bala biyaniyan dikişîne û bandorê li ser zêdebûna dolaran dike."

Prof. Dr. Hayri Kozanoğlu, têkildarî diyar kir ku heke Serokomar Erdoğan dest ji evîna "serokdewletiyê" berde dê dowîz dakeve û krîza aborî bi dawî bibe. *STENBOL*



## Jinên AKP'î şîdetê erê dikin

Fatma Kaplan Hurriyet di dema hevdîtinên Qanûna Bingehîn de rastî şîdeta parlementerên mêr ên AKP'î hat.

Fatma Kaplan Hurriyet anî ziman ku ev dîmenên şîdetê neyên cara ewil in, parlemnterên jin ên muxalif tim rastî şîdeta fîzîkî û devkî tên. Kaplan wiha axivî: "Her kes bû şahidê şîdetê. Ji xwe bi sala ye, li hemberî jinê tewrê îktîdara siyasî li holê ye. Bêyî hayê kesî jê hebe, dixwazin demildest vê pakêta Qanûna Bingehîn derbas bikin. Li meclîsê li dijî jinê tundî didome. Berê bi awayekî nepen dikin, lê niha bi awayekî aşkere dikin. Cara ewil e ku şideteke ewqas aşkere tê kirin. Li Meclîsê êrîşî jinekê kirin. Ev rewş nîşan dide ku bê çi qasî çavsorî bûne. Tişta xetere ew e ku jinên AKP'î tundiya li dijî jinê dipejirînin û rewa dikin."

Kaplan da zanîn ku dê li ber xwe bidin. *ENQERE*

## Daxwaza sereke demokrasî ye

Piştî hewldana darbeya 15'ê Tîrmeha 2016'an li dijî hemû kesên muxalîf operasyon, binçavkirin û girtinan dest pê kir û bi deh hezaran kes hatin binçavkirin û girtin. Li dijî van binçavkirin û girtinan bertek û nerazîbûn jî zêde dibin.

Nivîskarê rojnameya Cumhuriyetê Aydın Engîn xwest her kes li demokrasiyê xwedî derkeve û her kes ji bo parastina demokrasiyê ji dayîna bedelan re jî amade bin. Ergîn, anî ziman ku demokrasî bi bedelan tê parastin.

Endama Meclisa Jinan a HDK'ê Çigdem Kiliçgun Uçar jî anî ziman ku bi îlana OHAL'ê re zext û tundiya li ser jinan zêdetir bû û wiha got: "Hedefa mezin a AKP'ê ya sereke xistina jinê ye. Diwaze berî her tiştî jinan bike kole. Bi pergala OHAL'ê dixwaze bêtir pergala mêrserdest ava bike. Lê em di ferqa vê yekê de ne û em vê pergalê red dikin."

Hunermend Lale Mansur, jî anî ziman ku êdî mirov nikarin fikrên xwe aşkera bikin û wiha got: "Dixwaze civakeke bêdeng û bêbertek ava bike. Ev yek dê bandora xwe li hunerê jî bike. Heta niha min tundiyeke wisa nedîtiye. Hin hewldanên beşên muxalîf hene. Le divê ev zêdetir bibe." *STENBOL*



## Çima dilezînin?

Serokomarê tirk Tayyîp Erdogan di 12'ê çileyê de li Qesrê got "Di navbera kesên di dest wî de çek heye û kesê di dest wî de dovîz heye tu ferq tune ye" û bi vê gotinê pênaseyeke nû ya "endamtiya rêxistinê" kir.

Aborînas Erol Katircioglu, zêdebûna kûra dovîzî û krîza aborî nirxand û diyar kir ku, divê analîzên aboriyê yên hikumetê dev ji "teoriyên komployî" berdin. Katircioglu anî ziman ku divê bi taybetî îktîdar dev ji wê sekna xwe ya ku hemû derdorên civakê tune dihesibîne û nasnameya xwe ya siyasî ferzî wan dike, berde. Katircioglu wiha domand: "Tekparêzî li Tirkiyeyê nayê ferzkirin, kemalîstan 80 salan ev ceriband lê bi ser neketin. Ji ber vê, divê ji vê ders bê derxistin."

Katircioglu bal kişand ser pergala serokomariyê jî û di vê mijarê de israra guherandina Qanûna Bingehîn û wiha axivî: "Çima ev qasî lez dikin. Muhtemelen şabloneke wisa di mêjiyê wan de heye. Vê sererastkirinê têxin meriyetê û demildest sermayeya ereban bînin Tirkiyeyê.

Katircioglû diyar kir ku krîzeke kûr li ber derî ye û wiha got: "Dê enflasyon zêde bibe. Dê derkeve ser ji sedî 10'an. Heke Qanûna Bingehîn derbas bibe, dê dolar derkeve ser 4 TL'yî. Em hîn tam behsa krîza aborî nakin. Lê hemû nîşaneyên krîzê hene û di rojên pêş de dê ev krîza kûr li derî bixe." ENQERE



## Talûkeya dîktatoriyê

Endamê Koordînasyona Yekitiya Ji Bo Demokrasiyê Lêkolîner û nivîskar Kadir Akin, têkildarî niqaş û geşedanên li meclisê axivî. Akin diyar kir ku gelê Tirkiyeyê bi talûkeya diktatoriyê re rû bi rû ye.

Akin xwest ev karê qanûna bingehîn tenê ji meclise re neyê hiştin. Akin, xwest her kes bi şiyara "Ji bo her kesî demokrasî, Yekitiya Ji bo Demokrasiyê" li dijî faşîzmê eniyek fireh ava bikin û wiha got: "Di nava Yekitiya Ji bo Demokrasiyê de bi sedan nivîskar, rewşenbir, siyasetmedar nûnerên rêxistinên saziyên demokrasiyê hene."

Akin, têkildarî nîqaşên meclisê yên li ser guhertina Qanûna Bingehîn jî anî ziman ku ev nîqaş paşverûya siyasî ye û wiha got: "Ev hewldan Tirkiye dixe nava bîra tarî. Divê berî her tiştî em vê talûkeya li pêş Tirkiye ji her kesî re vebêjin. Divê em bibêjin ku ev paket meclisê bê wate û erk dihêle. Hemû hêza meclisê dikeve destê serokomar. Rastî ji civakê tê veşartin." ENQERE



## Firotin ji sedî 80 kêm bûye

Esnafên Tahtakaleyê diyar kir ku ji ber polîtîkayên Tirkiyeyê yên nexweşî û derve firotina îsal li gorî sala par ji sedî 80 kêm bûye. Li sûka Tahtakaleyê ku berê kirîn û firotin gelek zêde bû, niha pir bê deng e û êdî esnaf nikarin malên xwe bifiroşin.

Esnafê Tahtakale yê ambalajan difiroşe Îbrahim Guner (32), anî ziman ku êdî wekî berê muşterî nayên û li gorî sala par ji sedî 80 firotin daketiye. Guner, anî ziman ku geşedanên siyasî û polîtîkayên hikûmetê yên şaş ku li hundir û derve pêş dixe krîza aborî kûr dike.

Esnaf Îsmet Çeleng ê 80 salî ku 70 sal in şekir difiroşe anî ziman ku êdî welatî ji sibêroja xwe bi fikar in û di



nava fikarê de ne. Esnaf Îsmet Şahin (65) jî anî ziman ku êdî kar ne wekî berê ye. Esnaf Aydin Kocatekin (58) jî anî ziman ku ger ku ew qas bûyer û alozî hebin dê aborî jî ew qas xera bibe û wiha got: "Kar pir kêm bûye. Her ku diçe Tirkiye paşve diçe. Ez esnafê 30 salî me. Heta niha yekem car rewş wisa xera dibe. Esnaf Karker Aslan (18) jî anî ziman ku bi teqînên dawî kar pir xerab bûye û wiha got: "Piştî dolar zêde dibin karê me bêtir xera dibe." *STENBOL - DÎHABER*

www.arsivakurdi.org

# Li dijî dagirkeran çûn Qendîlê

**Bi sedan ciwanên ji başûrê Kurdistanê, li dijî nokerî û hewldanên dagirkeriyê yên dewleta tirk, ji bo destekê bidin gerîla berê xwe da Qendîlê. Ciwanan diyar kir ku ew dagirkeriyê qebûl nakin**



Piştî Pêşmergeyên Dêrîn, ku li dijî êrîşên dewleta tirk di 3'ê çileyê de çûn Qendîlê û destek da gerîla, duh jî bi sedan ciwanên ji Germiyan, Kerkûk, Silêmaniye û Raperînê bi heman armancê berê xwe da Qendîlê.

Ciwan li bajarokê Kilkey Kolen ê li navçeya Ranyayê li hev civiyan û bi konvoyeke ji wesayîtan ketin ser rêya Qendîlê. Ciwanên ji Kerkûkê ber bi Qendîl ve birê ketine li nuqteya asayîşa Degelê ya Koyê hatin rawestandin û destûr nenad ciwan derbas bibin. Piştî demekê ciwan ji asayîşê derbas bûn û çûn Qendîlê.

Ji van ciwanan Hawrê Ferîdûn li ser armanca çûyîna Qendîlê axivî û wiha got: "Em êdî dagirkerî û hevkariya bi vê dagirkeriyê ya li welatê xwe qebûl nakin. Lê belê pêşîgirtina li vê yekê tenê bi xwestinê nabe. Weke hêza herî çalak a civakê, em ciwan divê bi berpirsyariya vê rabin. Bi rêya vê yekê em hişyariyê didin dagirker û hevkarên wan. Eger li Şengal an jî li Qendîlê êrîşek li dijî gerîla bê kirin, weke ciwanên başûrê Kurdistanê em ê bêdeng nemînin."

Ferîdûn bal kişand ser serdana Pêşmergeyî Dêrîn ku di 3'ê Çileyê de li Qendîlê piştgirî dan gerîla û destnîşan kir, ev yek helwesta neteweyî ya rasteqîne. Ferîdûn wiha axivî: "Ew Pêşmerge şerê birakujiyê û dagirkeriyê baş dinasin. Em jî ne neçar in heman êşê bijîn û bi vî rengî bijîn. Ji ber vê yekê divê temamiya ciwanên Kurd hay ji xwe hebin û li pêşberî van xefikan hişyar bin." *QENDÎL - ANF*

# Ciwan ji bo Ocalan dest bi pêngavê dikin

Koordînasyona Komalên Ciwan ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pêngaveke nû didin destpêkirin.

Di daxuyaniya Komalên Ciwan de hat gotin ku rastiya têkoşîna 40 salan ku li keleha dawî ya berxwedana mirovatiya azad li navenda 3'emîn Şerê Cîhanê tê meşandin û wiha hat gotin, "Li tevahî parçeyên Kurdistanê, ya li ser gelê me tê ferzkirin xetek teslîmiyeta eşkere ye. Li Rojava jî, Rojhilat jî, Başûr jî, Bakur jî û dîsa li Ewropayê jî ya di bin maskeyên cuda de dixwazin bi kurdên azad bidin qebûlkirin, bi kurtasî koletî ye!"

Komalên Ciwan dijminahiya ku dewleta tirk li hemberî gelê kurd dimeşîne û banga seferberiyê ya Erdogan bi bîr xist û wiha got: "Bi neyartiyeke sondxwarî ya li dijî kurdan, li tevahî cîhanê hewl dide dijminantiya kurdan pêş bixe û herî zêde jî afirîner û Rêberê têkoşîna azadiya Kurdistanê Rêber Apo kiriye hedefa xwe. Li dijî Rêbertiya me, tecrîdeke dermirovî û hovane di meriyetê de ye. Çeteyên mêtinger di nav xefletê de difikirin ku bi tecrîdê ve wê bandora Rêber Apo kêm bibe. Lê bila bizanin ku ev faşîzma li ser Rêber Apo, ji bilî mezinkirina têkoşîna me ya şoreşê, ji bilî polakirina berxwedêriya me wê ji ti tiştekî din re nebe. Împaratortiya tirsê ya faşîzmê, wê li beramberî wêrektî û ruhê fedaî yên ciwanên şoreşger parçe parçe bibe. Tecrîd û sepanînên dermirovî yên li ser Rêber Apo dewam bike, pêwîst e tevahî ciwanên Kurdistanê yên birûmet bibin kabûsê faşîzmê, bi berxwedana xwe ve dijmin bilerizînin, cîhanê bihejînin. Li ser vî esasî, wek Komalên Ciwan em bang li tevahî ciwanên şoreşger ên Kurdistanê dikin ku li dor Rêber Apo bicivin bibin, ji bo derba dawî li faşîzmê bixin, dest bi hemleya azadiya Rêber Apo bikin. Pêwîst e tevahî cîhan bizane, em amade ne, em ê bi ser bikevin, em ê bi Rêber Apo re azad bibin." *BEHDÎNAN - ANF*



## Hevşaredarên Nisêbînê hatin binçavkirin

Li navçeya Nisêbînê ya Mêrdînê polîsan bi ser gelek malan de girt. Di serdagirtinan de hevşaredarên Nisêbînê Cengîz Kok, Sara Kaya, serokê Seyîd-Derê Abdullah Ongun, Heserokê DBP'ê yê navçeyê Sîraç Dînç, Suleyman Akin, rêvebirê DBP'ê Abdullah Yilmaz û welatiyên bi navê Cevdet Akat û Îsmet Akat ên ji gundê Tepeustu yê ne hatin binçavkirin. MÊRDÎN

## Azadiya ramanê hat cezakirin



3'yemîn rûniştina doza Hunermend Şanar Yurdatapan ê di çarçoveya "Gerînendeyê Nobeta Weşana Giştî" de piştgirî da rojnameya Ozgur Gundem, li 22'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Stenbolê hat dîtin. Yurdatapan, parastin kir û wiha got: "Mirov fikrên xwe bîne ziman û nerînên xwe parve bike mafê herî rewa yên mirovan e. Ev darizandin li dijî hiqûqê ye." Heyeta dadgehê li Yurdatapan Salek û 3 meh û 6 hezar TL ceza birî. STENBOL

## Polîsan bi ser Şaredariya Bêgiriyê de girt

Polîsên dewleta tirk avêtin ser Şaredariya Bêgirî ya Wanê û gelek malan. Di encama operasyonên qirkirina siyasî de 16 kes hatin binçavkirin.

Polîsan avêtin ser avahiya Şaredariya Bêgirî û li odeya Hevşaredaran dest bi lêgerînê kirin. Polîsên tirk piştî ku ji avahiya şaredariyê derketin vê carê jî avêtin ser malan.


Navê çend ji kesên hatine binçavkirin: Xebatkarê firina Halk Ekmek Ercan Akkuş, Ercan Dilmaç, Mesut Yilmaz, zarokê bi navê H.K., encumenê şaredariyê Turan Tunç, Nesîm Solmaz, Dogan Başak, Ekrem Karagule, Hevserokê DBP'ê yê Navçeya Bêgirî Mehmet Kaplan, Halîl Guler, Kemal Karagulle, Barahattîn Karagulle û Yusuf Karagulle. *WAN*

# 'Tirkiye li ser pişta me bûye bar'

Serokê Lijneya Pîşesazî û Enerjiyê ya Meclisa Bajarê Silêmaniyê Xalib Mihemed pêşketin û mijarên dawî yên Herêma Kurdistanê nirxand.

Têkildarî lijneya aborî ya di navbera Herêma Federal Kurdistan û Tirkiyeyê de hatîava kirin, Xalib Mihemed ani ziman ku ew lijne di dema serdana Serokwezîrê Tirk a li Hewlêr de hatiye avakirin û wiha got: "Ew lîjne tiştek çareser nake, ji ber ku Tirkiye bi xwe li ser me bûye barek. Hemû ew top balafirên Erdogan ku li Bakûr û Rojavayê Kurdistanê li hember kurdan bi kar tine, hemû bi pereyên me dike."

Li ser krîza li Tirkiyeyê Xalib Mihemed wiha got: "Tirkiye bi xwe di nav krîzek mezin a aborî de ye. Heta pereyê tirk li hember dolar bê qîmet bûye û ketiye. Ji ber wê Tirkiye nikare krîza me ya aborî çareser bike. Bila êdî destwerdana karê me neke, em ê bi xwe çareser bikin. Li Herêma Kurdistanê pirsgirêka me ya aborî nine, pirsgirêka me ya diziyê ye. Eger em dizan rakin, eger PDK û YNK danûstandinê petrolê tenê ji bo berjewendiyên xwe neke, wê demê pirsgirêka me ya aborî çareser dibe." Mihemed da zanîn ku PDK petrol û gazê dixe xizmeta Tirkiyeyê. *SILÊMANÎ-ROJNEWS*




## Ceza li Aydogan birîn

Rûniştina doza parlamentera HDP'ê ya Amedê Nursel Aydogan ku girtî tê darizandin li 2'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Amedê hat dîtin. Aydogan ku ji ber daxuyaniyek sala 2011'an dihat darizandin, bi riya SEGBÎS'ê amade bû. Aydogan da zanîn ku tevlibûna cenazeyan peywireke mîrovahiyê ye. Heyeta dadgehê li Aydogan 4 sal û 8 meh û 7 roj cezayê girtîgehê birî. AMED

## Ji bo Encû cezayê muebetê dixwazin

Der barê parlamenterê HDP'ê yê Şirnexê Ferhat Encû yê di çarçoveya lêpirsîna ji aliyê Serdozgeriya Komarê ya Şirnexê ve tê meşandin de hat girtin, piştî 5 salan têkildarî derbkirina Qaymeqamê Qilebanê Naif Yavuz ê piştî qetlîama Roboskiyê di dema serdana şînê de hatibû derbkirin, îdianama hat amadekirin. Di îdianameya hat amadekirin de, bi îdiaya Encû pehîn avêtiye qeymeqam der barê wî de cezayê giran ê heta hetayê hat xwestin. Doza ji aliyê Dadgeha Bilind ve ji ber "ewlehiyê" ji Şirnexê neqlî Amedê hat kirin, tê payîn ku dê di rojên pêş de dîroka rûniştina wê diyar bibe. AMED




# Zimangeha Kurdan Enstîtuya Kurdî

XELÎLÊ CELÎL

Baş tê zanîn ku Tirkiyeyê di Peymanê Lozanê de mafên perwerdehiya bi zimanê kurdî û bi zimanê kurdî weşan û çapkirina materyalên kurdî qebûl kirin. Lê piştî salên 1925'an bi plana Şark Islahatê ev maf ji destê kurdan girtin. Kurdî bû sedema kuştin û girtina gelek kesan û di sala 1928'an de bi kampanyaya 'Welatîno bi tirkî biaxivin (Vatandaş Türkçe konuş)' zimanê kurdî yekcarî hate qedexekirin.

Kesên ku kurdî axivî cezayên mezin lê hatin birîn, hatin cezakirin, hemû berhemên kurdî qedexe kirin. Ev rewş û tepisandin demeke dûr û dirêj domiya.

Li Kurdistana bakur têkoşîna ziman li gel gelek astengiyan jî heta roja îroyîn destkeftiyên xurt bi dest xistine. **Yek ji van destkeftiyan jî Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ye ku bi salan e ji bo zimanê kurdî xebatên pir girîng pêk anîn** lê bi KHK'a dawîn mohrek li deriyê wê jî xistin

Bi hatina ser kar deshilatdariya Demokrat Partiyê re kurdan careke din hewl da ku bi zimanê xwe berheman çap bikin û binivîsin lê bersiva Demokrat Partiyê ji ya komarperestan tundtir bû. Mirov dikare li mînaka 'Doza 49'an' binêre. Careke din rewşenbîrên kurd ji ber zimanê xwe hatin darizandin û cezakirin.

***Tevî hemû zextan dest ji dozê bernedan***

Bi destûra bingehîn a 12'ê Îlona 1982'yan careke din kurdî hat qedexekirin, ji bilî tirkî bi zimanên din perwerde û weşangerî careke din hat qedexekirin. Di 1991'an de parlamenterên kurd ji ber ku bi zimanê xwe axivîn deh sal ceza lê hat birîn. Sedem dîsa dijberiya ziman û çanda kurdî bû. Helbet li gel hemû van kiryar û biryaran jî kurdan dev ji zimanê xwe berneda. Têkoşîna kurdan a ziman her ku çû xurttir bû.




***Enstîtuya Kurdî tê avakirin***

Dema ku mirov baş lê binêre dikare bibêje Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê berhema tovên sedsalî ya têkoşîna kurdan e û di dûmahîka vê têkoşînê de komeke rewşenbîren kurd ên wekî Mûsa Anter, Îsmaîl Beşîkçî, Cemşîd Bender, Feqî Huseyîn Sagniç di sala 1992'an de di bin mercên gelekî dijwar de, Enstîtuya Kurdî ava kir. Ji wan avakaran li hin kesan cezayên giran hatin birîn û wekî Apê Mûsa hin kes jî hatin qetilkirin. Bi dehan caran zext li ser wan çêbûn û gef li wan xwarin.

***Armanc têkoşîna li dijî pişaftinê bû***

Mebest ew bû ku înkarkirina kurdî bikin hebûna kurdî. Careke din rihê Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran Celadet Bedirxan û Ehmedê Xanî şa bikin û li dijî pişaftina zimanê kurdî tê bikoşin. Li mîrateya çandî ya kurdan xwedî derkevin û bibin bingeh ji pêşeroja perwerdehiya kurdî re. Her wisa kurdî ji nav lepên pişaftin û tunebûnê rizgar bikin. Kurdan careke din li dîrok û çanda wan vegerîne û kelepora kurdî bê xwedî nehêlin.




ziman gelek materyal û berhemên wekî kovara Fêrname hatin amadekirin.

***Bi hezaran xwendekar û mamoste gihandin***

Ji sala 2006'an vir ve hema bigire salê derdorê hezar xwendekaran ji kursên perwedehiyê yên Enstîtuya Kurdî perwerde wergirtiye.

Ji Amerîkayê, Ewropayê bigire heta welatên Asyayê gelek kesên biyanî dihatin enstîtuyê û perwerde didît. Bi sedan mamoste ji vê saziyê derketine. Cara yekemîn kovareke zanistî Zend jî dîsa ji nav weşanên enstîtuyê derket ku heta niha 25 hejmarên hatine derxistin.




***Xebatên Enstîtuya Kurdî***

Li gel gelek kêmasî û bêderfetiyan jî Enstîtuya Kurdî gelek berhem afirandin û nêzî 80 pirtûk û berhemên çap kirin. Du ferhengên kurdî ku ji 80 hezar peyvan pêk dihatin, hatin çapkirin. Du pirtûkên rêzimanê hatin çapkirin, ji bo hîndekariya zaravayê kurmancî seta hîndekariyê ya bi navê Hînker ku ji 3 pirtûkan pêk tê, hat çapkirin. Her wiha Hînker Kirmanckî ji bo astên yekemîn û duyemîn hatin çapkirin. Dîsa ji bo perwerde û hîndekariya ziman û çanda kurdî ji bo pergalê dibin sedema tirs û fikaran. Ya din tê zanîn ku li Stenbolê 4 milyon kurd hene. Enstîtu ji bo kurdan tekane cih bû ku kurd bikarin zimanê xwe lê hîn bibin, bixwînin, binivîsin û hînî zarokên xwe bikin.

Niha mohr li zimanê 4 milyon kesan xistin. Cih nîn e ku malbat zimanên xwe fêrî zarokên xwe bikin. Di heman demê de ji bo pêşerojê derfet û cih neman ku li Stenbolê li ser ziman û çanda kurdî xebat bên kirin.

Helbet ev girtin ne cara ewil e û dê nebe cara dawîn jî. Têkoşîna kurdan a ziman ji Elî Herîrî bigire heta Melayê Cizîrî, ji wî bigire heta Celadet Bedirxan, ji Cemiyeta Hêvî ya şagirtan bigire heta enstîtuyê berdewam kiriye. Ev al bêguman li erdê namîne.

Mirov li van xebatan dinêre û dibîne ku bi rastî jî enstîtuyê xebatên gelekî binirx kirine. Lê derfet hebûna û ev astengiyên siyasî nebûna bêguman dê xebatên pir baştir derketana holê.

***Dijberiya li dijî zimanê kurdî***

Bêguman yekane şîroveya li hemberî ziman û çanda kurdan xweranegirtin e. Gava mirov li kêşeya kurd dinêre mijara sereke mijara ziman e.

Lewre xebatên ziman nahêlin çerxa pergalê ya pişaftinê li gorî dilê wan bigere û xebatên qada

***Me dîwar hilweşandine***

A niha armanca yekemîn bi rêyên hiqûqî sêbare vekirina enstitûyê ye. Heke di demeke kin de encam neyê girtin em dê hewl bidin ku saziyeke din vekin û em ê nehêlin ku 4 milyon kes û zarokên wan bêyî zimanê dayika xwe bimînin. Kurdî sêwî namîne, ji ber ku tovên me reh vedane erdê û rehên hezar salî ne.

Her çi qas dixwazin bazarê li ziman teng bikin jî lê me dîwar hilweşandine. Em ê nehêlin careke din dîwaran li dora ziman lê bikin.

***Mohra korsanwarî***

Li Tirkiyeyê piştî hewldana darbeyê ya 15'ê Tîrmehê, desthilatiya siyasî bi Biryarnameyên di Hikmê Qanûnê de (KHK) hewl da desthilatiya xwe qewîntir bike. Ji bo vê yekê jî di serî de berê xwe da muxalîfan û hema ketûber dest bi girtina sazî û dezgehan kir.

Nemaze saziyên kurdan bûn hedefa herî pêşîn. Li Kurdistana bakur û metropolên Tirkiyeyê hema bêje saziyên kurdan neman ku mohr li deriyên wan neketibe.

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê jî ji vî bayê faşîzan nesîbê xwe hilda û mohrek li deriyê wê jî xistin. Lê xuya ye ku ji ber xofa wan a ji bertekên civakî bi awayekî korsanwarî nîvê şevê bi ser de girtin û bêyî agahdariyekê bidin rêveberên saziyê deriyê wê mohr kirin.

***Çavnebariya dewleta tirk***

Enstîtuya Kurdî her sal perwerdeyê dide nêzikî hezar xwendekar û hezkiriyên zimanê kurdî. Ji xeynî vê, bi gelek xebatên hişmendiyê yên wekî panel, semîner û gotûbêjan radibe û her wiha wek weşanxaneyekê jî dixebite.

Vê xebatê jî bi taybetî li Stenbolê, bi giştî li tevahiya Kurdistanê ji bo pêşîlêgirtina polîtîkayên asîmîlasyonê roleke girîng dilîst. Çavnebariya hikumeta tirk jî ber vê yekê ye.

***Dewletê nekarî têkoşîna ziman asteng bike***

Her wiha desthilatiya tirk xwest bi hin xebatên wekî beşên zimanê kurdî di zanîngehan de, dersên hilbijartî li dibistanên seretayî û kanalên kurdî pêşî li têkoşîna ziman a li Bakur bigire. Lê belê wekî her carê dîsa bi ser neket û nekarî pêşiya têkoşîna ziman bigire.

Lewma jî serî li girtin û mohrkirina saziyên ziman ên wekî Kurdî-der, Akademiya Ehmedî Xanî, dibistanên seretayî yên ku bi zimanê kurdî perwerdeyê didin û Enstîtuya Kurdî da.




www.arsivakurdi.org

## Şahiyên 'Serê Salê' dest pê kir

**HER SAL DI 13'Ê** meha çileyê de li gelek bajarên Kurdistanê şahiyên 'Serê Salê' tên pîrozkirin. Ev şahiya ku bi sedan sal e ji hêla civakên li ser vê erdnîgariyê ve tê pîrozkirin, xwedî kevneşopiyeke mezin e. Li gorî sersala hîcrî, ji bo kurdan di vê rojê de serê salê ye. Gelek welatiyên cilên jin û mêran li xwe dikin, bi boyax û teniyê rûyên xwe boyax dikin û mal bi mal digerin; ar, rûn û hwd. tiştan berhev dikin. Di nava kesên digerin de hin kes li dahol û erbaneyê jî dixin û kî çi bixwaze wek diyarî dide. Ev şahî li hêla Serhedê wek 'Kose' tê pênasekirin û heta salên 2000'î jî gelek dihat pîrozkirin. AMED



# Albuma Dîwana Dubeytî derket



*Hunermendên NÇM'a Stenbolê gelek beytên Baba Tahir Uryan berhev kirin û di bin navê 'Dîwan-a Dubeytî' de albumeke nû amade kir. Album ji helbest, reqs û stranan pêk tê*

NAVENDA NÛÇEYAN

Abuma Dîwana Dubeytî ya ku ji aliyê hunermendên NÇM'ê ve ji rûbaiyên Baba Tahirê Uryan pêk tê, derket. Rûbaiyên Baba Tahirê Uryan ji hêla hunermendên Navenda Çand û Hunerê ya Mezopotamyayê (NÇM) ve hatin amadekirin, bi navê albuma 'Dîwan-a Dubeytî' derket. Dîwana Dubeytî ku berhema hunermendên NÇM'ê ya 6 salan e, di serî de bi navê performansa reqs û muzîkê, li gelek bajarên Kurdistanê li gelek cihan hat pêşandan. Albuma ku ji rûbaiyên hunermendê kurd Baba Tahirê Uryan ên hatin berhevkirin, Zelal Gokçe, Nurcan Degîrmencî, Meral Tekçî û Serhat Kural tê de solîstiyê dikin.

Baba Tahirê Uryan ji berjewendiyên kesayetî, ji hebûna xwe, xwe rizgar kir û li pey hebûna mutleq meşiya û wek yekane rê, derwêşî hilbijart. Baba Tahirê Uryan ji bajarê Hemedan ê herêma Loristanê ya rojhilatê Kurdistanê ye. Helbestvanê mezin di dawiya sedsala 10'emîn û destpêka sedsala 11'emîn de jiyaye. Navê wî Tahir e û wek Baba Tahir û Tahir Uryanê Hemedanî jî tê nasîn. Li gorî çavkaniyên dîrokî, Uryan li bajarê Hemedanê tê dinê û li Loristanê jiyaye û di sala 1010'an (H. 401) de li Hemedanê çûye ser dilovaniya xwe û li taxeke biçûk a bi navê Bun-î Bazar ya dikeve bakurê rojavayê bajêr û li ser girekî biçûk hatiye definkirin.



Di nava kurdan de ji kesên ruhanî re 'bav, bavo, baba' tê gotin. Ji ber vê ji Uryan re 'Baba' tê gotin. Baba Tahir bi eslê xwe kurd e, lê hin derdorên fars vê wiha qebûl nakin û îdia dikin ku Baba Tahir faris e. Heke qebûl bikin ku Baba Tahir kurd e, wê demê dê qebûl bikin ku bingeha wêjeya farisî ji hêla kurdekî ve hatiye damezirandin. Uryan bi nêrîna xwe ya felsefe, îmge û têgihana bêhempa ya xwezayî helbestên giranbuha derxistine holê. Pirtûka wî ya Dubeytî di sala 1983'yan de li Tehranê bi navê "Dîwanî Şî'rî Baba Tahirê Hemedanî" hat weşandin. Hêj gelek beytên wî winda ne.



Di sala 2015'an de gelek hunermendên NÇM'a Stenbolê yên wek muzîkjen, şanoger, reqsvan û hunermendên rîtmê hatin gel hev û piştî xebateke 7 mehan Dîwana Dubeytî ya ji muzîk, helbest û dîmenên reqsê derxistibûn. Bi hevkariya hunermendên NÇM'a Stenbolê dîsa bi heman navî albumek hat derxistin. Di albuma nû de Zelal Gokçe, Nûrcan Degîrmencî, Meral Tekçî û Serhat Kural stranan dibêjin.

## Jinên zana ên Rûsyayê: Şaman

NAVENDA NÛÇEYAN

Jinên zana ku li Rûsyayê wek 'şaman' tên pênasekirin, ji hêla gel ve tên ziyaretkirin û ev ziyaret bûne aktivîteyên rojane. Kesên tên serdana wan dixwazin jinên şaman ji bo wan diayan bikin.

Komara Tuva di nav sînorê Federasyona Rûsyayê de li ser sînorê Sîbiryaya başûr a Mogolistanê ye. Li vê herêmê hem jin û hem jî mêr çanda şamaniyê ya ku gelekî kevn e, didomînin. Ev herêma bi navê Tuva, xwe li pişt çiyayên Sayanê veşartiye û ji gelek mirovan re malovaniyê dike. Gelek mirov ji bo vê xwezaya wê ya bêhempa û enerjiya wê ya kozmîk bigirin, diçin Tuvayê. Kesên ku diçin wir di heman demê de başdarî rîtuelên şamanan dibin. Wênekêşa rûsî Anastasia Ivanova, cara yekemîn dema li Londonê zanîngehê dixwîne, diçe Tuvayê û bandoreke mezin a xweza, şahî û stranên wan lê dibe.

Ivanova aşkera dike ku ew heta niha sê caran çûye wê herêmê û der barê serdana xwe de van tiştan dibêje: "Cara yekemîn ez ji bo wêneyên şamanan bikişînim hatim vir, piştre ji bo serlêdanê hatim. Min li wir hezkirin û enerjiyek hîs kir, stran guhdar kirin. Hatina vir ne gelekî hêsan e. Tuva bi çiyayan hatiye pêçan. Kesên bixwazin bên vir, divê di Komara Xakassiyayê re derbas bibin. Bifikirin li Rûsyayê jî ji bo mirov biçe paytexta Tuvayê li Kyzylê, bi rêk û pêk rêwîtiya hewayî tune ye."



### ÇANDA HERÊMÎ

Her çendî li Rûsyayê civaka herî zêde xiristiyanên ortodoks bin jî; lê di vê erdnîgariya gelekî mezin de gelek çand, ol û baweriyên cuda hene. Ji budîzmê bigire heta îslamê, heta gelê marî yê wekî paganên Ewropayê tên dîtin jî li vê herêmê pir zêde ne. Lê ya girîng bi sedan sal e li Tuvayê rîtuelên rûhanî yên otantîk didomin.

Ivanova dibêje: "Baweriya şamanîzmê li vê herêmê tê nasîn, lê ne wek baweriyeke mezhebî tê zanîn. Her çendî di serdema Sovyetê de rîtuelên şamanan hatibin qedexekirin jî lê bi veşarî berdewam kirine û di salên 90'î de ji nû ve dîsa derketine holê. Bêguman keda Mongush Kenîn-Lopsan di vir de ne pêkan e ku bê piştguhkirin. Ew lîdera ruhanî ya şamanên serdema me ye, dîrokzaneke biqîmet, nivîskar û helbestvan e."

### JI CIHÊN DÛR TÊN

Ivanova piştrast kir ku kesên tên serdana şamanan, ji cihên gelekî dûr tên û der barê kesên tên serdanê de ev agahî dan: "Hin kes ji bo ku wan bibînin tên vir. Kesên tên Tuvayê, bi taybetî ji bo tenduristî, dewlemendî, şansê baş, kesên bixwazin bibin xwedî zarok, ji bo aramiya malbata wan zêde be, kesên xwe ji ruhên xirab biparêzin, tên serdana şamanan û diayên wan dixwazin."



## NÇM li DBP'a Konakê xebatan dimeşîne

Navenda Çanda Mezepotamyayê (NÇM) ya Îzmîrê ku bi salan e xebatên çand û hunerê dida meşandin, ji gelek hunermendên biqîmet ên wek Hozan Hogir re jî malovanî kiribû. Piştî bi biryara KHK'ê NÇM'a Îzmîrê û bi dehan saziyên ziman û çandê li Îzmîre hatin girtin, lê xebatkarên navendê dest ji xebatên xwe bernedan. Ciwan niha xebatên xwe yên kursê li saziyên cuda didomînin. Gelek ciwan ji bo kursên nû diçin navenda BDP'ê ya Konakê. Ciwanên beşdarî kursan bûn, aşkera kir ku tu qedexe nikarin pêşî li xebatên wan bigirin, ew ê di serî de li DBP, HDP û li her malê xebatên xwe berdewam bikin. ÎZMÎR



## Arzela li HDP'a Şîrînevlerê xebatan dimeşîne

Navendên çand û hunerê yên li bajarên Tirkiyeyê xebatên çandê didin meşandin, perwerdeyên xwe yên hunerî berdewam dikin. Di rojên borî de di bin navê OHAL û biryarên KHK'ê de, li Kurdistan û Tirkiyeyê bi sedan saziyên civakî hatibûn girtin. Bêguman ji vê pêla faşîzan a dewleta tirk, gelek saziyên kurdan ên wekî NÇM, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, KURDÎ-DER, Akademiya Ehmedê Xanî û bi sedan saziyên din jî para xwe girtibû. Navenda Çand û Hunerê Arzela kursên gîtar, erbane û tembûrê li navenda HDP'a Şîrînevlerê berdewam dike. STENBOL



## Divê em xwedî li çanda xwe derkevin

Li navçeya Kelarê ya ser bi Germiyanê ve, şahiya bûkanînê li gorî çanda kurdan tê berdewamkirin. Serê sibê bûk û zava li ber qeleya Şêrawane siwarî wesayita hespan bûn û bi dahol û zirneyê ber bi cihê şahiyê ve diçin. Zavayê bi navê Mihemed Kemîl ji ajansa Rojnewsê re axivî û got: "Ji bo zindîkirina çanda kurdî min ev şahiya qedîm li dar xist. Ez dixwazim hemû ciwanên me li ser çanda pêşiyên me bimeşin. Divê gelê me vê çanda qedîm ji bîr neke." KELAR



www.arsivakurdi.org

Rojeva Medya
14 Çele 2017 Şeme

HUSEYÎN ALÎ

# Ganî hêzê demokrasî û kurdî vindetişê xo nîşan bidî



Rojevanê Tirkîya ra yewe zî bedilîyayîşê qanûno bingeyî yo. Cewherê qanûno bingeyî de çîyêk nêbedilîyeno, tena selahîyetî dewrê kesêk benî. Bedilîyayîşê ke yenî viraştiş, goreyê ruhê qanûno bingeyî yenî viraştiş.

Çîyo ke Kenan Evrenî qanûno bingeyî yê 12ê êlule de nêşînaybî bikero, ewro Tayyîp Erdogan keno. Eke merdim bi no hawa biewnîyo, Tayyîb Erdogan Kenan Evrenî ra hîna zêde bîyo wayîrê hêzî. Nika zî bi bedilîyayîşê qanûno bingeyî do no bibo fermî.

Bi no hawa perdeyê ke karakterê faşîstî yê qanûno bingeyîyê 12ê êlule ser padayêne, ameyî wedarnayîş. Nê het ra do netîceyê ci yê xeyrin zî bibî. Xora qanûno bingeyîyo ke dişmenê kurdan bî, nika wazenî hîna zaf bikerî dişmenê kurdan.

Raştîya xo de bedilîyayîşê ke yenî viraştiş, seba ke vernîya qirkerdişî de astengî nêmanî, yenî viraştiş. Cok ra nê qanûno bingeyî rê do kurd û heme hêzê demokrasî vajî nê.

No qanûno bingeyî seba kurdan zêde çîyan nêbedilneno. Sîstemo qirker hîna zêde aşkere beno. No bedilîyayîşê qanûno bingeyî firsendêk vejeno vernîya kurdan; kurdî eşkenî vernîya nê sîstemî de vindetişê xo nîşan bidî. Nê qanûno bingeyî rê vatişê nê, yeno manaya îqtîdarîya AKP û MHPyî de zî vindetişî. Yanî merdim eşkeno vajo, seba kurdan referandumêk o. Kurdî zî do qebulnêkerdişê xo yê nê sîstemî do bi nê firsendî nîşan bidî. Eke wina bibo o wext merdim eşkeno vajo ke kurd û hêzê demokrasî vera nê îqtîdarî de vindetişêko ortax nîşan dayî. Referandumê nê qanûno bingeyî seba kurdan yeno na mana.

Çi qanûno bingeyî yê nikayîn demokratîk o, çi zî bedilîyayîşê ke yenî kerdiş. Cok ra nê bedilîyayîşê qanûno bingeyî firsend dano ke merdim vera ci de vindetişê xo nîşan bido. Heto bîn ra zulmo ke 1 serre û nîm o ke îqtîdarê AKP û MHPyî bi kurdan kenî, esto. Firsendê vera polîtîkayanê îqtîdarê AKP û MHPyî de vindetişî zî esto. Ganî kurdî nê munaqeşe û referandumê qanûno bingeyî rê wina biewnî. Neke sîstemê qirkerdekar wina yo an zî hawayêko bîn o, hende muhîm nîyo. Heta ke qanûno bingeyîyêko demokratîk nêbo, kurd û hêzê demokrasî do xoverdayîşê xo bidomnî. Çimkî ancax bi xoverdayîş do qanûno bingeyîyêko demokratîk awan bibo.

***Seba kurdan problem tena bedilîyayîşê ke yenî viraştiş nîyî; şexsê nê bedilîyayîşan de vera dewleta dagîrkere, îqtîdarê AKP û MHPyî û kerdişanê îqtîdarî de vindetiş o***

Lazimîya Tirkîya bi qanûno bingeyîyêko demokratîk yê ke do bi xoverdayîş bêro awankerdiş esto. Tirkîya de heme qanûno bingeyîyî wextê îqtîdarê derbe de ameyî viraştiş. Tena qanûno bingeyî yê 1921 prosesêko heme şar û bawerîyî meclîs de ca girewtî, ameyo viraştiş. Raştîya xo de meclîso ke weçînayîşê 7ê Hezîrana 2015 ra dima awan bîyo, meclîso ke seba viraştişê qanûno bingeyîyê demokratîk tewr nizdî bî. Xora nê semedî ra netîceyê weçînayîşê 7ê Hezîrane nêame qebulkerdiş û netîceyê weçînayîşê 7ê Hezîrane rê derbe ame viraştiş. Reyna nê semedî ra qerarê şerî ame girewtiş û cok ra ewro wazenî qanûno bingeyîyêko hîna otorîter awan bikerî. Bedilîyayîşê qanûno bingeyîyo ke ewro yeno viraştiş, netîceyê derbeya ke weçînayîşê 7ê Hezîrane rê ame kerdiş o. Cok ra kurdî vindetişê kurd û hêzê demokrasî yeno manaya vera derbeya ke netîceyê weçînayîşê 7ê Hezîrane rê bîye de vindetişî.

Zaf manayê ke kurdî bedilîyayîşê ke hetê îqtîdarê AKP û MHPyî rê vajî nê, estî. Seba kurdan problem tena bedilîyayîşê ke yenî viraştiş nîyî; şexsê nê bedilîyayîşan de vera dewleta dagîrkere, îqtîdarê AKP û MHPyî û kerdişanê îqtîdarî de vindetiş o. Cok ra ganî kurdî vera nê qanûno bingeyî de bivajî nê û no het de hesas têbigêrî. Ganî kurdî nêvajî nê bedilîyayîşî ma eleqeder nêkenî.

Qet şik çin o ke kurdî bi têkoşîn û hêzê xo yê rêxistine do cuya xo ya demokratîk û azade awan bikerî. Ti îqtîdar seba kurdan cuyêka demokratîke awan nêkeno. Tirkîyaya ke demokratîke nîya de heme îqtîdarî qirker î û dişmenê kurdan î. Heta ke kurdî bi têkoşînê xo karakterê na dewlete nêbedilnî, do qanûn û qanûno bingeyî her tim qirker bibî. Cok ra heta ke bi bedilîyayîşê radîkalan qanûno bingeyîyêko demokratîk nêvirazîyo, seba kurdan ti manaya xo çin a. Labelê ganî vindetişê vera qanûno bingeyîyê nêdemokratîk de parçeyê tewr muhîm yê têkoşînê demokrasî yo.

Nê bedilîyayîşê qanûno bingeyî nîşanê ma da ke zîhnîyet, qanûno bingeyî û qanûnî dişmenê kurdan î. Tîya de çi demokrasî û çi zî rewşa kurdan bîya babeta munaqeşeyê. Munaqeşeyê derheqê wa selahîyetî kesêk de kom bibî an grûbêk de kom bibî yenî kerdiş. Labelê karakterê faşîstî yê qanûno bingeyîyê 12ê êlule nîno munaqeşekerdiş. Tena kam nê sîstemo otorîter îdare bikero, yeno munaqeşekerdiş. Cok ra senî ke kurd û hêzê demokrasîyî qanûno bingeyîyo kehen ra vatbî nê, do yê neweyî ra zî vajî nê. Sebebê vatişê nê zî, bedilîyayîşê ke hewl danî yenî viraştiş, antîdemokratîk î. Çimkî kurdî bedilîyayîşê ke yenî viraştiş, demokratîk î an nê ra ewnîyenî û yê ke demokratîk nîyî rê do vajî nê.

Nê bedilîyayîşê qanûno bingeyî bingeyê cepheyê demokrasî awan kerdo. Kurd û hêzê demokrasî eşkenî nê firsendî bi hawayêko baş bixebetnî.



Sûrela

## Roşta serê sodirî nejdî ya



Meral Kuçuk

Gorê vilavokê heqanê mordemî her kes reng, netew, kokê ci yê cematkî, cîns, zon, îtiqat, fîkrê xo yê siyasî û bînî, milkê ci, dîna rê amayena ci ya kî sebebanê bînan, çi beno bibo, têdust ê, pêro heqan û serbestiyan ra şikînê feyda bikerê. Tirkiya ke îmza esta binê nayê, nika nînan ra kamcîne vîneme? Ya kî werte homete de ma kî niyada raşt nî pêro yenê hurende ardene? Ewro hîn ke herîşî estê ke her hetî ra ramenê. Hama jû qese esto vanê; zilmê xo jede bibo, hîn bibo ke, peyniya xo bi xo biyaro. Zilmê xo jede bibo ke hîn lezîna ke cayê xo ra bero war. Ma kî tarîxê dîna de niyade vîneme ke pêro kesê ke şaranê xo ser de zorvajiye kerdî, en peyniye de bi xo kerdê vîndî. Serva vîndî kerdena înan kî lazim o ke tekoşîne berê dayene. Xora tarêxê jû homete ke bi tekoşîna ci ya yena nûsnayene. Pêro qehremanî ke demê nî xoverdayişan de vejiye werte. Bedelanê girsan dayene ra peyser nêmende. Iyê ke ewro canê xo ya na şiyayis rê benê raye, qehramaniya en pîlî misnenê.

Qawxaya ke di serranê peyenan ramena, xeylê herîşanê pîlan rê ke sahîdene kerd. Her gucikê welat de jû sanike esta. Domanê ke may û piyê xo kerdê vîndî. Ya kî maye ke çeney û lazê xo kerdê vîndî. Iyê ke çeyê xo ame riznayene, werte na zimiston de xeman de, cayanê xirave de weşiya xo ramenê, raşt ke jû qese çin o ke qehremaniya înan, sarreberziya înan biyaro zon. Bi hezaran çeyî ewro bi poşt vejiyayena qomê xo ya payra yî. Nayê ra tepiya ke xo vîrra mekerême înan. Teyna Şirnex biyarême çimanê xo ver. Sûke de sarrêberze ardê ci hal. Serva vurnayena demografiya herême pêro kayî sûke ser de kaykerdî. Eke ewro çixaş kî destê kam ra çik ame serva nî sûkan virast, o waxt jedena dawa xo rê ke dawa weşiya de serbest rê wayir ke vejîme.

E ke her gucik ra verra herîşan jû veng bivejiyo, faşîzme ke honde rew yena pisiqnayene. Her bedelo ke yeno dayene, têkoşîn û gurenayisê şoreşgerî ewro benê toxûmê ameyena serbest. Toxûmo ke nî rozanê giranan de bi zerrê weşiya erjîno hard, eynî demî de heyfê pêro dezan o. Nî rozan de verra pêro dormeyî ke faşîzme ra qeyir jû raya bîne, serbestiya şaran wazenî înan ser de serestisî, neheqî, pêguretene, kistene her ke şî jede benê. Nî rozan de namê dewlete teyna biya qûweta hêrîşî, qûweta kistene. Endî kes besenêkeno vajero tivariya mi esta. Her cawo ke zilm û zorvajiye esta, ê cayan de namê weşiya ke tewa nêmanena. Eke raya xo ver estene xo rê çinene we, o waxt besekenê xeyalê rozanê têdûst, haştiye û xeleşiyayişî bikerême.

Iyê ke wastîsanê şarê ra tersenê, roze bi roze kenê vîndî. Pêro nî planê ke çarçewe ci de nî herîşî ramenê, puç vejîne. Iyê ke qûwetê tarî ra cenê en peyniye de binê roşte de xo kenê vîndî. Kistene, talan, xesp ra tewa nêvezene. Iyê ke tarî bi xo yê se kenê wa bikerê en peyniye de kenê vîndî. Lazim o ma jûbîn xo vîr ra mekerîme. Wayisê jûbîn ra qûwetê bicerême. Destê kam ra çik yeno en jede kî cayê ke bi xoverdayişî xoseriya ameyîbi riznayene, welatizanê ucayan rê wayir vejiyayene xo vîr ra mekerîme. Roşta serê sodir nejdi ya, tariyê înan vila kena.

www.arsivakurdi.org

# Fotografê dayîke û Demîrtaşî suc ame hesibîyayîş

AZÎZ ORUÇ / AMED - DÎHABER

Qezaya Bismilî ya Amedî de muxtarê 3 taxan parekerdişanê xo yê medyaya komelkî ver hetê Qeymeqamîya Bismilî ra wezîfe ra ameyî girewtiş.

Mudirîya Asayîşî ya Qeza 5ê teşrîna peyêne de seba îfadedayîşî veng dayo muxtarê Taxa Esentepe Alaattîn Tekîn, muxtarê Taxa Sanayî Mehmet Bayindir û muxtarê Taxa Altiokî Mursel Zorogluyî.

Wexto ke muxtarê taxa Esentepe Alaattîn Tekîn şono mudirîya asayîşî, ewja de parekerdişê Tekînî yê medyaya komelkî de kerdbî, ci rê yenî persayîş.

Fotografê dayîka Tekînî ke milê aye de bi rengê kesk, sûr û zerd yew egal esta, fotografêko Rojawan de ameyo antiş û fotografo ke Quranê Kerîm milê pêşmergeyêk de esto, ci rê yenî persayîş. Fotografê dayîka Tekînî 'propagandaya sucî' yeno hesibîyayîş û Qeymeqam ci wezîfe ra girewto.




### FOTOGRAFÊ DEMÎRTAŞÎ SUC BÎ

Mehmet Bayindiro 10 serrî yo ke Muxtarîya Taxa Sanayî keno zî mudirîya asayîşî de raştê persanê winasîyan yeno. Fotografêko Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalan û Mele Abdullayê Timokî têhet de yî û fotografê




Mehmet Bayindir


Alaattîn Tekîn

Hemserekê HDPyî Selahattîn Demîrtaşî ke fotografê ci yê profîlî yo, yenî persayîş. Bayindir vano zafane parekerdişê mi wextê prosesê çareserî de mi pare kerdbîy û suc hesibîyayîşê înan nîno qebulkerdiş.

### AZAYÎ SEY QAYÛM AMEYÎ TAYÎNKERDIŞ

Alaattîn Tekîno ke wezîfe ra amebî girewtiş va 'yê ke weçînayîş reyde ameyo, ancax bi weçînayîş eşkeno şêro' û qiseykerdişê xo wina domna: "Serekkomar Erdogan her hewte muxtaran kom keno, vano 'muxtarî ser heme çî de yî'labelê herême de wina nîyo, her çiqas ke ti sucê ma çin o zî ma wezîfe ra ameyî girewtiş û herinda ma de azayî ameyî tayînkerdiş. Herinda ma de zî qayûmî yenî tayînkerdiş. Seba ke OHAL esto, ma nêeşkenî heqê xo zî bigêrî."

## Sebebê zêdebîyayîşî cezanêkerdiş o


Murat Çakir


Selçuk Kastarli

Meclîsê Ewleyîya Karî û Weşîya Karkerî (ÎSÎG) raporê xo yê 2016 amade kerdbî û goreyê raporî serra 2016 de 1970 karkerî merdî û rapor de bi hezaran neheqîyî estî.

Babete ser o Pisporê Ewleyîya Karî û aktîvîstê ÎSÎGî Selçuk Karstarliyî û endamê Meclîsê ÎSÎGî yê Stenbolî Murat Çakirî qisey kerdî.

Karstarliyî va 'wexto ke merdim raporî ra ewnîyeno, vîneno ke cayê karî ke kesêk ra heta 50 kesî tede xebetîyenî, nê cayan de mergî hîna zaf bîyî' û qiseykerdişê xo wina domna: "Ma paweyê ke dewlete kesê zeyîf û yê ke neheqî bi înan yeno kerdiş, bipawo. Labelê hetê dewlete ra mergê karkeran sey qeder û fitrat yeno dîyayîş. No nizdîbîyayîş nîno qebulkerdiş."

### HER SERRE 2 HEZAR KARKERÎ MIRENÎ

Karstarliyî dewamê qiseykerdişê xo de va 'seba xebatêka biewle tena çend bedilîyayîşê teknîkî bes o' û qiseykerdişê xo rê wina dewam kerd: "Tirkîya de hewtane ganî saetê xebatî 54 saet bibîyêne, la karkerî 72 saetan xebetîyênî. Hukmat ewleyî û weşîya karkeran ra berpirsîyar o, labelê hukmat herinda karkeran, karmendan paweno. Vatişê 'fitratê karî de esto', 'mi dî, weş merdbî' û 'şima kar kenî ganî şima netîceyê ci biancî' zî cok ra yenî vatiş. Her serre nizdîyê 2 hezar merdimî cînayetê karî de mirenî. Eke herinda karkeran de karmendêk bimerdêne, wina bîyêne?"

### BERPIRSÎYARÎ HESABÊ CI NÊDANÎ

Çakirî zî va 'seba ke berpirsîyarî hesabê ci nêdanî, cînayetê karî zêde benî' û qiseykerdişê xo wina qedêna: "Soma û Şêrwan de cînayetê karî bîy, kam şîna se bikero. Yê ke qerar danî, nînî mehkemekerdiş. Reyna wezîr û burokratî ceza nêgênî. Yê ke bî sebebê mergê 301 kesan, ti ceza nêgêno." KOCAELÎ - DÎHABER

# Yayke û wareza teslîmbîyayîşî qebul nêkerdî

**Yayke Sozdar Gasyake û warezayê aye Tajdîn Gasyakî vera abluqaya Hezexî ya dewleta tirk de telîmbîyayîşî qebul nêkerdî, heta peynî pîya şer kerdî û resayî şehadet**

YAŞAR AKSU / ŞIRNEX - ANF

Wextê xoverdayîşê xoserî yê Sûr, Cizîr, Nisêbîn, Farqîn, Hezex, Şirnex, Gever û sewbîna cayan de xeylê qehremanî ameyî nîşandayîş û hîkayeyê înan bi tîpanê altûninan tarîx de ameyî nuştiş. Nînan ra yewe zî wextê xoverdayîşê Hezexî de ame cuyayîş.

Yayke Sozdar Gasyake (Sozdar Zinarîne) û wareza Tajdîn Gasyakî (Botan Tajdîn) vera hêriş û abluqaya dewleta tirkî de xoverdayîşêko destanî nîşan dayî û bîyî bêmir.

Tajdîn Gasyak (Botan Tajdîn) qezaya Hezexî ya Şirnex de yeno dinya û keyeyê xo de waye û birayan ra yê 4. o. Tajdîn hîna dibistana seretayî de seba ke sîstemê perwerdeyî yê tirkî ra eciz beno, wazeno fek dibistane ra verado, la bi zorîya keyeyî dibistana seretayî qedêneno. Dima ra badê serrêk reyna agêreno mekteb û wextê lîseyî de wazeno ke bi ziwanê xo perwerde bivîno.

### TAJDÎN KEDKAR O

Tajdîn seba ke rewşa ekonomîke ya keyeyî baş nîya, her çiqas ke ci ra pîlêr 3 birayê ci estî zî, berpirsîyarî gêno milê xo ser. Goreyê vatişanê embazanê ci Tajdîn kesêko rêzdar û heskerdişî reyde pirr o û mîyanê şarî de zaf yeno heskerdiş. Wexto ke embazê ci qala Tajdînî kenî, vanî ke Tajdîn kesêko hetê kede û têkoşînî de zaf averşîyaye yo, tebîet û heywanan ra zaf hes keno. Cok ra ge-ge hetkarî dano pîyê xo yo ke şiwanetî keno. Tajdîn wexto ke prosesê Kobanê dest pêkeno, beşdarê xebatanê ciwanan beno û nizdîyê di serran rojname û kovare vila keno. Her çiqas ke nêweşîya brucella ci reyde esta zî Tajdîn zaf xebetîyeno. Wextê xoverdayîşê Kobanê de perwerde vîneno û dima ra beşdarê YDG-Hyî beno.





### SOZDARÊKA BÎNE

Sozdar Gasyake (Sozdar Zinarîne) zî Hezex de yena dinya. Keyeyê aye welatperwer o, xora nameyê Sozdare zî nameyê gerîlayêka cinî yê PKKyî yo. Sozdare zî wextê wendekarîya xo de bi wendişê kitabê Rayberê Şarê Kurd Abdullah Ocalanî hewl dana nasnameya xo awan bikera. Sozdare hem wanena û hem zî wextê betlaneyî de sey karkerîya demserrî xebetîyena. Sozdare hem jîhatî ya û hem zî şermok a, cok ra hetê embazanê xo ra zaf yena heskerdiş. Sozdare seba ke zulmo ke îqtîdarê AKPyî û Erdoganî vînena, beşdarê YDG-Jinî bena.

### TÊKOŞÎNÎ WEÇÎNENA

Pîyê Sozdare Alî Şamanî derheqê kênaya xo de wina va: "Kênaya mi bi waştişê xo nê rayîrî weçînaye. Dewlete aye û heme embazanê aye bi hawayo zalimane qetil kerde. Ez têkoşînê kêna, torin û embazanê înan reyde îftîxar kena."

Dayîka Tajdînî Fahrîye Gasyake zî va 'hem waya mi û hem zî lajê mi teslîmîyetî nê, xoverdayîşî weçînayî. Ya raşt zî na bî. Çimkî wayîrê rastikên yê nê erdan, ciwanê ke seba nê erdî canê xo danî yî. Helbet do yewe roje hesabê nînan bêro persayîş. Ez do heta peynî pey têkoşînê înan de biba."

## Îxrackerdiş netîceyê problemê kurdan o



6ê çele de 3 qanûnê neweyî rojnameyo fermî de ameyî weşînayîş, badê weşînayîşê 3 qanûnan 631 akademîsyenê ke îmze eştbî vilaweka aştî bi Qerarnameyê Hukmê Qanûnî (KHK) wezîfe ra ameybî îxrackerdiş. Goreyê qanûnê 679. Unîversîteyê Munzurî ra 10 akademîsyenî ameybî îxrackerdiş.

Babete ser o akademîsyenê Beşa Sosyolojîyî Emîne Sevîme qisey kerde.

### NEHEQÎYÎ ZÊDE BENÎ

Emîne Sevîme qiseykerdişê xo de va 'ma benê şahidê tewfîqkerdiş, îxraçkediş, padayîş û neheqîyan' û wina domnaye: "Kemalîstî wextê xo de sey îcratanê AKPyî kerdî û partîyê ke îslamo sîyasal pawenî zî sey înan kenî. La mabênê înan de cîyayîyêk esta. Kemalîstî sere de bi şîddet hêrişan kenî dewre, dima ra zî xo nerm kenî. Labelê AKP çepê ci yo. Sere de nerm o, dima ra hêrişkar beno û rîyê xo yê raştîn nawneno."

### ALTERNATÎF ÇIN O

Emîneye qiseykerdişê de va 'ma proseso xirabin de wezîfeyê xo ser de bîyî, la kesê ke cuyê xo vînî kerdbî, estbî' û wina qedênaye: "Ma eşkenî teberê Unîversîteyan de zî xebatan bikerî. Ganî her kes bikewo mîyanê çalakîyan û yewbînan rêxistine bikero. Yewbîyayîş ra vîşêr ti alternatîfê ma çin o." *DÊRSIM – ŞÛJIN*

## Domanan de alerjîya werdî

Domanî zaf hesas î û tayê çîyî bi hawayo lez domanan ser de tesîr kenî. Werd û awe daxî domanan ser de sedemê tesîran o.

Babete ser o Dr. Saîme Kilinçe qisey kerde.



Dr. Saîmeye bale ante weşîya domanan ser û va 'weşî de çîyêko şenik daxî beno ke bibo sebebê çîyê pîlî' û wina domnaye: "Eke badê werdî dormeyê fekê merdimî bibo sûr, laşê merdimî de şopê sûrî bibî, laşê merdimî de wirnayîş, ziwan û lewan de masayîş, qelibnayîş û qebz merdimî de bibo, beno ke alerjîyê werdî (Şaplore) xo dayo teber."

Dr. Saîmeye qiseykerdişê xo de va 'domanan de teşhîsê alerjîya werdî asan nîyo' û qiseykerdişê xo wina qedênaye: "Eke şitê maye ra dima werdê ke dîyênî domanan de rewşêka anormale bêra dîyayîş, beno ke domanî de şaplore bibo. Werdê ke domanan de benê sebebê alerjîye; şite, hake, mase, findiq, fistiq, guze, vame, soya û xele yî. Seba pawitişê domanan ganî heta 1 serrîya domanî şitê manga nêro dayîş." AMED - ŞÛJIN

ROJEVA Medya
14 Çile Şemî 2017

ROJEVA MEDYA Ararat Basın - Yayın Reklamcılık Adına
İmtiyaz Sahibi: Murat SEKMEN
Yazı İşleri Müdürü: Mehmet Çetin ALTUN
Yönetim Yeri: Kooperatifler Mahallesi Akkoyunlu 4. Sokak Sarıca Apt. 2/3 Yenişehir-DİYARBAKIR
Tel: 0 (412) 224 35 93
Baskı (ÇAP): İstanbul: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Küçükçekmece İSTANBUL Tel: 0 (212) 580 63 81
Adana: Arslan Güneydogu Gazetecilik, Matbaacilik, Kağıtçılık Yeni Doğan Mah. 2108 Sok. No:13/A Yüreğir / ADANA Tel:0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
e mail: rojevamedya@hotmail.com







# Koçer li benda biharê ne

Koçerên Êlihê, li gundê Meymûniyê yê di navbera çiyayên Ramanê bakur û Ramanê rojhilat ên di nava Êlih û Heskîfê de ye konên xwe vedane û li benda hatina biharê ne. Koçerên ku mehên xwe yên zivistanê li gund derbas dikin dema bihar tê jî derdikevin zozanan. Koçer bêyî ferq û cudahiyê bixin nav jin û zilaman dixebitin. Jin bi karên nav konê û xwedîkirina pez re mijûl dibin, zilam jî di saetên zû yên sibê de pez dibin çiya û wan diçêrînin. Ev parvekirina kar di mehên havînê de jî li zozanan didome. Koçerên Êlihê her sal berê xwe didin zozanên Colemêrgê.

## ZIVISTANÊ DEŞT BIHARÊ ZOZAN

Adem Savun (38) da zanîn ku ji dema hatiye dinê heta niha şivantiyê dike, koçerî gelekî zehmet e û wiha got: "Feydeya koçeriyê gelek e û ez nikarim dev jê berdim. Em sibê saet di 6'an de şiyar dibin û heta şevê em di nav pez de ne. Hinek caran em bi karên xwe yên din re mijûl dibin. Em zivistanê li vir derbas dikin. Em bi meşê diçin û tên. Havînê jî em diçin zozanên Colemêrgê. Em di dema çûyînê de li cihên bilind bêhna xwe vedidin."

## BI SOBÊ XWE GERM DIKIN

Savun anî ziman ku di konekî de 6 malbat dijîn, bi darên dişewitînin xwe germ dikin û wiha pê de çû: "Di vê konê de 5 hezar pez heye. Em zivistanê pez nadoşin û rojê du caran êm didin wan. Heta biharê em pezên xwe xwedî dikin. Dema rêwîtiya ber bi zozanan ve dest pê kir em êm nadin pez û rojê carekê pez diçêrinin. Em penîr, goşt, şîr, hirî û mastê xwe ji pezê xwe digirin. Em havînê şîr, penîr û mast çêdikin. Em van difiroşin bazirganên ku tên zozanan." ÊLIH- DÎHABER

# Li Rihayê 'EVÎN' bi kevokan xweş e



Li Rihayê muptelayên kevokan, pêşanderên zindî yên gotinên dahêner (mûccîd) Tesla ne ku dibêje: "Belkî çivîkek ji dil û can ji min hez bike. Min ji vê kevokê wekî ku mêrek ji jinekê hez dike, hez kir; wê jî wisa ji min hez kir."

Li bazara çivîkan a li 'Çarşiya Jêrîn' a Qada Haşimiye ya Rihayê, buhayê kevokan ji 20 lîreyî dest pê dike heta 35 hezar lîreyî diçe. Hin ji esnafên bazarê û bikir dibêjin, di navbera wan û kevokan de têkiliyeke hestewar heye û hin jê jî tînin ziman ku, ew bazirganiya vî karî dikin û pê debara xwe dikin. Lê belê hem kesên bazirganiyê dikin û hem jî kesên wek hobiyê kevokan xwedî dikin, pêşanderên zindî yên gotinên Tesla ne ku dibêje: "Belkî çivîkek ji dil û can ji min hez bike. Min ji vê kevokê wekî ku mêrek ji jinekê hez dike, hez kir; wê jî wisa ji min hez kir. Her ku lê xwedîtiyê lê dikim, jiyana min watedartir dibe."

## HEZKIRINEKE JIDIL E

Li çarşiyê mirov rastî çeşnên (cure) kevokan ên wek gubbe, şamo, îsraîl, beleka bexdadî, şervaî û hwd. tê. Kevokên li gorî çeşnên xwe buhayên wan diguherin, êmê wan jî cuda ne. Li bajêr li "qehwexaneyên çivîkan" an jî "malên çivîkan" îhale pêk tên û li vir meraqdarên çivîkan hem bi riya îhaleyan çivîkan difiroşin hem jî der barê wan de dibin xwedî agahî. Li bazara çivîkan a li Qada Haşimiyeyê, firoşkar hem wek hobiyê azweriya xwe têr dikin hem jî bi firotina wan debara xwe dikin. Yek ji meraqdarên çivîkan Kadir Sakizci (28) got ku ew li dikana xwe bi sedan çivîkan xwedî dike û di navbera wî û çivîkan de têkiliyeke hestewarî heye.

Sakizci diyar kir ku ew ji zarokatiya xwe ve kevokan xwedî dike û anî ziman ku ew bi saya çivîkan stresa li ser xwe diavêje û wiha got: "Heke li malê çivîkên min tune bin ez ê bipeqim. Ev meraq e, evîn e. Dostên herî biqîmet ên mirovan çivîk in. RIHA - DÎHABER

# Ji zarokên reqqayî 'şûkran'

Li rêya Reqqayê, ji zarokên ji aliyê Hêzên Sûriyeya Demokratîk ve hatin rizgarkirin, ji bendika dil "şûkran"ên xwe pêşkêşî şervanan dikin. Zarokên ku ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar bûne bi awirên mişt hêvî li pêşerojê dinêrin





Li ser rêya Reqqayê van rojan şervanên Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) herî zêde peyva 'şûkran'ê dibihîzin ku di erebî de tê wateya 'spas'. 'Şûkran'a ku herî zêde li ser zimanê zarokan e, ji bo şervanên HSD'ê jî dibe hêz û bi vê hêzê xurttir berê xwe didin DAIŞ'ê.

Mihemd Elo (13) yê kêfxweşiya xwe ya azadiyê bi "şûkran, şûkran"ê tîne ziman got ku bi saya HSD'ê tirsa li ser wan rabûye. Elo got, dema DAIŞ hebû nikaribûn derkevin derve û diya wan tim ew vedişartin û diyar kir ku gelek hevalên wî ji aliyê DAIŞ'ê ve hatine revandin.

## BI DIZÎ DIJIYAN

Mistefa Hemûdê 15 salî yê ji bin serweriya DAIŞ'ê rizgar bû jî, behsa qedexeyan kir. Hemûdê anî ziman ku ji çûyîna dibistanê, lîstikan bigire heta gerînê her tişt qedexe bû û bi wê baweriya ku HSD'ê daye wan dikene û wiha dibêje: "Em pir deyndarê HSD'ê ne. Heta ew nehatibûn, hema bêje dê û bavên me qet destûr nedida em derkevin derve. Hela rewş ji bo zarokên keçîn xerabtir bû. Em her tim bi fikar bûn; dê kengî werin me bibin. Malbata min xwest min bişîne devereke din lê belê çênebû. Ji ber vê bi piranî em bi dizîka dijiyan."

Nesîme Abdullah a 14 salî jî, bextewariya xwe bi hêstirên çavan anî ziman. Nesîmeya delal diyar kir ku DAIŞ'ê nedigot biçûk an mezin e, hemû zarokên keçîn direvandin û axaftina xwe wiha domand: "Em difikirîn, 'Gelo dê îro kê bibin?' Ji bo me derve qedexe bû. Jixwe yên derketana derve, dibirin. HSD û kurd hatin. Em ji wan natirsin. Ew wek malbatekê ne, pir baş in. Ji ber ku em rizgar kirin, em 'şûkranên' xwe pêşkêşî wan dikin." *REQQA - DÎHABER*

# Bodrum bi RES'an tê talankirin

Li Bodruma Muglayê ku navendeke girîng a turîzmê ye, li cihên wekî Gokova, Yalikavak, Gumuşluk û Akyarlarê tê tê payîn ku dê 12 Santralên Enerjiya Bayê (RES) ên ji 680 turbînan pêk tê, bên çêkirin. Li gelek herêman, li gel biryarên dadgehan û bertekên welatiyan jî avakirina RES'an didome.

Endamê Platforma Parastina Hawirdora Nîvgirava Bodrumê Mehmet Çilsal diyar kir ku di serî de Bodrum hemû deverên Herêma Egeyê bi RES'an tên talankirin.



Çilsal got ku ji ber polîtîkayên derve yên hikumetê turîzm têk çûye û diyar kir ku bi RES'an re rewşa heyî xerabtir bûye û wiha got: "Her çi qas zivistanan li Bodrumê turîzm tune be jî li van çiyayan meş pêk tên. Ev çiya ji bo eko-sîstema herêmê çiyayên gelekî girîng in. Bi RES'an re jiyana giyaneweran di bin xetereyê de dimîne. Her wiha rûberka riwekî (nebat) jî hatiye texrîbkirin. Tu kes guh nade xweza û jiyana mirovan." *MUGLA - DÎHABER*

www.arsivakurdi.org